

‘AKİFÊ WANÎ & ‘AŞIQ OSMAN SİPKÎ Û MEM Û ZÎNÊN WAN ÊN BI TIRKÎ DI KOLEKSÎYONA A. JABA DE

Abdurrahman ADAK*

PUXTE

Di koleksiyona A. Jaba de li ser bingeha Mem û Zîna Xanî du Mem û Zînên bi tirkî ku ji aliyê du nivîskarên cuda ve hatine nivîsîn hene. Ew jî berhemên Akifê Wanî (Kurd 39) û Aşiq Osman Sipkî (Kurd 38) ne. Her du muellifan jiyana xwe di sedsala XIXem de bûrandine. Wanî, xelkê Wanê ye û burokratekî girîng ê serdema xwe ye. Sipkî jî ji eşîra Sipkan e û ji gundekî nêzî Erzîrûmê ye. Wanî, berhema xwe di 1856an de nivîsiye, lêbelê nekariye xilas bike. Nuxxeya Jaba tekane nuxxeya vê berhemê ye. Heçî Sipkî ye, wî jî berhema xwe di 1273 (1856-1857)an de nivîsiye. Du nuxxeyên vê berhemê hene: Nuxxeya Tehranê û ya Jaba. Ji ber ku di nuxxeya Tehranê de tarîxa nivîsîna berhemê û tarîxa istinsaxa wê yek e, bi ihtîmaleke mezin ev nuxxe ya muellif e. Daneyên berdest nîşan didin ku nuxxeya Jaba di sala 1283 (1866-1867)an de li ber nuxxeya muellif hatiye istinsaxkirin. Her du nuxxeyên koleksiyona A. Jaba dema muellifên wan hatine Erzîrûmê li ser daxwaza Jaba hatine istinsaxkirin. Wisa xuya ye ku istinsax bi lez û bez hatiye kirin. Lewra di nuxxeyan de huner û teknîkên berhemên destnivîs li ber çavan nehatine girtin. Taybetiyeke her du nuxxeyan ew e ku şûna Mem û Zînê bi navê “Riyazê Eşq”ê (bi xwendineke şaş Reyahîne Eşq) hatine binavkirin. Her çî be veguhestina van nuxxeyan bi rêya koleksiyona A. Jaba bo roja me gelekî girîng e. Di gotarê de em ê bîyografîya Wanî û Sipkî di çarçoveya zanyariyên nû de ron bikin, li ser her du destnivîsan analîzeke kodîkolojîk bikin û di hin xalên binîqaş de hizrên xwe îfade bikin.

Bêjeyên Sereke: Koleksiyona A. Jaba, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Aşiq Osman Sipkî, Akifê Wanî, Mem û Zînên bi tirkî, kodîkolojî.

AKIF-İ VANÎ & ‘AŞIK OSMAN SİPKÎ VE A. JABA KOLEKSİYONUNDAKİ TÜRKÇE MEM Û ZİNLERİ

ÖZ

A. Jaba koleksiyonunda Ehmedê Xanî'nin kaleme aldığı *Mem û Zin* esas alınarak yazılan farklı yazarlara ait iki tane Türkçe Mem û Zin nüshası bulunmaktadır. Bunlar Akif-i Vanî (Kurd 39) ve Aşık Osman Sipkî (Kurd 38)'nin eserleridir. Her iki müellif yaşamlarını XIX. yüzyılda geçirmiştir. Birincisi, Vanlı olup dönemin önemli bir bükratıdır. İkincisi ise Sipkan aşiretine mensup olup Erzurum'a yakın bir köydenir. Akif-i Vanî eserini 1856 yılında yazmış ancak tamamlayamamıştır.

Makale Gönderim Tarihi: 01.07.2017, Kabul Tarihi: 31.07.2018
Doi: 10.26791/sarkiat.449874

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.
abdurrahmanadak@gmail.com, Orcid ID: 0000-0002-9124-1605

Jaba nüshası eserin bilinen tek nüshasıdır. Aşiq Sipkî ise eserini 1273 (1856-1857) yılında kaleme almıştır. Sipkî'nin eserinin iki nüshası bilinmektedir: Tahran nüshası ve Jaba nüshası. Tahran nüshasında istinsah tarihi ile eserin telif tarihi uyuştugu için büyük ihtimalle bu nüsha müellif nüshasıdır. Eldeki verilere göre Jaba nüshası 1283 tarihinde müellif nüshasından istinsah edilmiştir. Jaba koleksiyonunda yer alan her iki nüsha da müellifleri Erzurum'a geldiklerinde Jaba'nın isteği üzerine Erzurum'da istinsah edilmişlerdir. Ancak istinsah işleminin aceleye geldiği anlaşılmaktadır. Zira nüshalarda kitap sanatları ve tekniklerine fazla riayet edilmemiştir. Nüshaların bir diğer özelliği de "Mem û Zîn" ismi yerine "Riyaz-ı Aşk" (yanlış okuma ile "Reyahîn-i Aşk") ismiyle isimlendirilmiş olmalarıdır. Her ne olursa olsun bu nüshaların Jaba Koleksiyonu yoluyla günümüze ulaşmış olmaları çok önemlidir. Makalede Vanî ve Sipkî'nin biyografilerini yeni bilgiler ışığında gün yüzüne çıkartacak, her iki yazma üzerinde kodikolojik bir analiz yapacak ve konu ile ilgili tartışmalı bazı hususlarda görüşlerimizi ifade edeceğiz.

Anahtar Kelimeler: A. Jaba koleksiyonu, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Aşiq Osman Sipki, Akif-i Vani, Türkçe Mem û Zîn, kodikoloji.

AKIF-I VANÎ & 'AŞIK OSMAN SİPKÎ AND THEIR TURKISH MEM Ü ZÎNS IN A. JABA COLLECTION

ABSTRACT

In the Jaba collection, there exist two copies of Turkish Mem u Zîn, written by different authors, based upon the Kurdish Mem û Zin of Ehmedê Xanî. They are works of Akifê Wanî (Kurd 39) and Aşiq Osman Sipki (Kurd 38). Both authors lived in XIX. century. The former is from Van and a significant diplomat of his time. The latter is a member of Sipkan tribe and from a village near Erzurum. Akifê Wanî wrote down in 1856 but could not finish it. The copy of Jaba collection is the sole known copy. As for Aşiq Sipki, he wrote down his work in 1273 (1856-1857). Two copies of Sipki's work are known: Tahran copy and Jaba copy. As inscript date and writing date are coincided, most likely this is the author's own copy. According to available data, the Jaba copy was inscripted form author's copy in 1283. Both copies of the Jaba collection were inscripted in Erzurum at the request of Jaba when their authors came in Erzurum. However it seems that the inscription was dane hastely. Because writing arts and techniques were not followed properly. Another significance of the copies is that instead of Mem û Zîn title, they are named by "Riyaz-ı Aşk" (by misreading "Reyahîn-i Aşk"). In any way it is important that these copies have reached today via Jaba collection. In the article will reveal the biographies of Wanî and Sipkî in the light of new information, conduct a codicological analysis on both scripts and express our opinion on some controversial issues.

Keywords: A. Jaba collection, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Aşiq Osman Sipki, Akifê Wani, Turkish Mem u Zîn, codicology.

DESTPÊK

Di koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên kurdî de du Mem û Zînên bi tirkî hene ku yek ji wan a ‘Akifê Wanî û ya dî jî ya ‘Aşiq Osman Sipkî ye. Mem û Zîna Akifê Wanî di jimareya Kurd 39 û ya ‘Aşiq Osman Sipkî di jimareya Kurd 38’ê de cih digirin. Ev her du berhem herçiqas bi zimanê tirkî hatine nivîsîn jî, ji gelek aliyên ve bi kurdolojiyê ve jî têkildar in. Berî her tiştî her du berhem di koleksiyoneke destnivîsên kurdî de cih digirin ku di qeydên wan ên arşîvê de jî navê “kurd” hatiye bikaranîn. Ji aliyekî dî ve muellifên wan (‘Aşiq Osman Sipkî û ‘Akifê Wanî) du kesayetên kurd ên tarîxî ne bi awayekî siruştî pêdivî bi nasandina wan heye. Dîsa ev her du berhem, wek du berhemên ku mijarên xwe ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî wergirtine, rengvedana edebiyata kurdî di edebiyata tirkî de temsîl dikin û ji vî aliyê ve di berawirdkirina edebiyatên kurdî û tirkî de wek mijareke girîng derdikevin pêş. Bêguman ev tev jî girîngiya mijarê bi awayekî aşkera diselmînin. Lêbelê divê em bibêjin ku berawirdkirina van Mem û Zînan û Mem û Zîna Xanî ne armanca vê gotarê ye. Di gotarê de du armancên sereke hene. Armanca yekem ew e ku biyografiya her du muellifan bê ronkirin ku her du muellif jî heta niha bi agahiyên kêr û şaş hatine nasandin û pêdivî bi sererastkirina van şaşiyên heye. Armanca duyem jî ew e ku li ser Mem û Zînên wan ên tirkî ku di koleksiyona A. Jaba de cih digirin analîzeke kodîkolojîk bê kirin ku ev di heman demê de sînor û rêbaza gotarê jî îfade dibe. Çawa tê zanîn kodîkolojî tê wateya zanista destnivîsariyê ku ji hemû aliyên ve destnivîsan ji bo xwe dibe mijara lêkolînê (Ji bo kodîkolojiyê bnr. Binbîn&Şewqî, 2005). Em ê jî van her du nuxeyên destnivîs li gor rêbaza nasandina nuxeyên destnivîs bidin nasandin û li ser xalên wek navên muellif, mustensix û berhemê, cih û dema istinsaxê, sebebê istinsaxê, eslê nuxeyê, pêwendiya her du nuxeyan tesbît û analîzan bikin û di van biwaran de tiştên ne zelal ron bikin. Qeydên ku di van her du destnivîsan de cih digirin, taybetiyên destnivîsan ên fîzîkî, hunerî û kalîgrafîk, zanyariyên biyografîk ên her du muellifan û taybetiyên koleksiyona A. Jaba dê di tesbît û analîzên me de rêberiyê bikin.

Di gotarê de ji bilî destpêkê sê beşên bingehîn û beşên encam, jêder û pêvekan cih digirin. Di beşa yekem de bi mebesta ku ji mijara gotarê re bibe rêxweşker em dê bi kurtî û giştî li ser diyardeya “Mem û Zînên bi tirkîya Osmanî” rawestin û jimara Mem û Zînên bi tirkî û muellifên wan tesbît bikin. Di vê beşê de bi taybetî jî em dê li ser tesbîtîkirina muellifê Mem û Zîna Kurd 38ê rawestin ku mijara gotara me ye jî. Lewra nuxeya Kurd 38ê tûşî nisbetkirina du muellifên cuda hatiye ku yek ji wan çawa ku qeydên koleksiyona A. Jaba jî diselmîne Aşiq Osman Sipkî ye û yê dî jî Ehmed Faiq e. Bi gotineke vekirî li gor nêrînekê ‘Aşiq Osman Sipkî wek Ehmed Faiq hatiye qebûlîkirin. Loma pêwîst e em bizanin ka gelo ‘Aşiq Osman Sipkî û Ehmed Faiq bi rastî jî heman kes in, yan du kesayetên cuda ne? Di vê beşê de me hewl da ku em vê pirsê bibersivînin û bi vî awayî jimara kesayetên ku bi tirkî Mem û Zîn nivîsîne ron bikin. Ev yek di tesbîtîkirina biyografiya ‘Aşiq Osman Sipkî de jî dê bibe diyarker ku beşa duyem a gotarê ji bo vê mijarê hatiye terxankirin. Lewra zanyariyên biyografiya ‘Aşiq Osman Sipkî li

gor pêwendiya wî bi Ehmed Faiq re dê biguherin. Eger ew Ehmed Faiq be biyografiyeke cuda û eger ne Ehmed Faiq be biyografiyeke cudatir dê li pêşberî me be.

Di beşa duyem de em dê li ser biyografi û nasnameya tarîxî ya muellifê Kurd 39ê 'Akifê Wanî û yê Kurd 38ê 'Aşiq Osman Sipkî rawestin. Ji ber ku muellifên van her du Mem û Zînan heta niha di lîteratura kurdî de zêde cih negirtine û nehatine naskirin û agahiyên ku derheqê wan de hatine belavkirin jî kêr û şaş in, bi rastî jî pêdivî bi tesbîtkirin û belavkirina biyografi û nasnameya wan a tarîxî heye. Mixabin derheqê van her du kesayetên de di dest me de zêde çavkanî tunene, loma jî di tesbîtkirina biyografiya wan de herî zêde em dê xwe bispêrin têbînîyên ku di koleksiyona A. Jaba de cih digirin ku ev têbînî mijarê heta asteke bilind çareser dikin. Hêjayî gotinê ye ku berhemeke ku li ser rêvebirên sinceqa Bazîdê bi navê *Bayezid Sancağı ve İdarecileri* (Karataş, 2014) hatiye nivîsîn jî di ronkirina biyografiya Akifê Wanî de gelekî bi kêrî me hat.

Di beşa sêyem de ku beşa herî berfireh a gotarê ye, em dê ji aliyê kodikolojiyê ve li ser her du nusxeyên destnivîsên her du Mem û Zînan bi tirkî rawestin, wan bidin nasandin û analîz û nirxandinekê li ser wan bikin. Di vê beşê de em dê ji bo navên her du Mem û Zînan Koleksiyona A. Jaba sernavekî taybet jî vekin. Lewra di her du nusxeyan de bi awayekî enteresan şûna ku navê "Mem û Zîn"ê li berheman bê kirin ku ya siruştî ev e, navekî cuda li wan hatiye kirin û ya balkêştir jî ev nav ji aliyê lêkolîneran ve bi du şêweyên cuda hatiye xwendin: "Reyhânê Eşq" û "Riyazê Eşq". Me jî mijar bi hûrgulî pêşkêş kir û di çarçoveya taybetiyên kalîgrafîkên navan û wêneyên wan de hizra xwe îfade kir.

Piştî beşên encam û jêderan, di dawiya gotarê de di beşa pêvekan de ji destnivîsên her du berheman hin wêne hatin bicihkirin.

1. MEM Ê ZÎN DI TIRKIYA OSMANÎ DE

Çi werger be, çî adaptasyon yan jî nezîre be, nivîsîna Mem û Zînan bi tirkî, bi gotineke dî veguhestina Mem û Zîna Ehmedê Xanî bo zimanê tirkî, diyardeyeke tarîxî ya edebiyatên kurdî û tirkî ye ku di encama têkilîyên siyasî û civakî yê kurd û tirkan de derketiye meydanê. Pêwendî û danustandinên edebiyatên kurdî û tirkî bi piranî bi şêweya rengvedana edebiyata tirkî li ser ya kurdî, carinan jî bi şêweya rengvedana edebiyata kurdî li ser ya tirkî xwe nîşan daye ku ev yek xwe dispêre pozisyona biavantaj a zimanê tirkî û ya bêavantaj a zimanê kurdî. Her bi çî awayî be, em dibînin ku kurdî heta astekê rengê xwe daye edebiyata tirkî û guman tune ku Mem û Zînan tirkî ji bo vê yekê wek nimûneyên herî bihêz derdikevin pêş (Adak, 2015, r. 75-110).

Bi qasî ku em dibînin di qonaxên tarîxî de veguhestina Mem û Zînan bo zimanê tirkî li ser du serdeman dikare bê dabeşkirin: Serdema klasîk/Osmaniyan û serdema modern/Cumuhûriyetê. Ji aliyê şêweyê ve jî bi giştî dikare bê gotin ku Mem û Zînan tirkî di serdema klasîk de telif û di serdema modern de werger in. Herçiqas di serdema klasîk de hin Mem û Zînan wek tercume hatibin binavkirin jî, ji ber ku di peywenda wê serdemê de mebest ji tercumeyê ne wergera lîteral e, ew jî

wek telîf dikarin bèn qebûlîkirin ku di vê gotarê de jî her bi vî awayî serederî bo wan dê bê kirin. Çawa ku ji aliyê pisporan ve jî hatiye dupatîkirin, wergera serdema klasîk û wergera serdema modern ne heman tişt in û wergera serdema klasîk ne wergereke lîteral bi wateya îroyîn e, berevajiyê wê veguhestineke hunerî û azad e ku ji aliyê mutercim ve wek telîfeke nû tê hizirkirin (Ji bo agahiyên berfireh bnr. Levend, 2008, r. 80-88; Tek, 2018, r. 101-110). Di serdema klasîk de îlham ji *Mem û Zînê* hatiye wergirtin û li ser bingeha wê îlhamê di kirasê zimanekî cuda de û bi teserrufên curbicur mijar ji nû ve hatiye hûnandin. Lêbelê di serdema modern de *Mem û Zîn* bi awayekî lîteral bo zimanê tirkî hatine veguhestin.

Di çarçoveya agahiyên berdest de di wê serdemê de pênc heb *Mem û Zîn* bi zimanê tirkî hatine nivîsîn. Ji van *Mem û Zînan* sê heb jê ji aliyê me ve hatibûn nasandin ku ew jî yên Ehmed Faiq, ‘Ebdul’ezîz Xalis û Zulfîqar Fethî ne (Adak, 2012, r. 16-23). Lêbelê piştî aşkera bû ku di serdema klasîk de du *Mem û Zînên* dî jî bi zimanê tirkî hatine nivîsîn. Yek ji wan a *Aşiq Osman Sipkî* (Nezmî) ye (Öztürk 2017; Tek, 2018) û ya dî jî ya *Akifê Wanî* (Tek, 2018, r. 140-153) ye. Bi van *Mem û Zînan*, kojima *Mem û Zînên* tirkî yên serdema klasîk dibe pênc ku bi bawerîya me ji bo nîşandana asta tesîra *Mem û Zînê* ev jimar bi tena serê xwe bes e.

Hebûna pênc *Mem û Zînên* tirkî, ji aliyê muellifan ve tê wê wateyê ku di serdema klasîk de kesên ku *Mem û Zîn* bi tirkî nivîsîne jî her pênc in. Lêbelê bi vê jimarê re têkildar pirsgirêkek heye ku tam li vê derê divê bê çareserkirin. Lewra li gor nêrînekê *Aşiq Osman Sipkî* û Ehmed Faiq ne du kesayetên cuda ne, berevajiyê wê heman kesayet in. Li gor vê *Mem û Zîna* ku bo *Aşiq Osman Sipkî* tê nisbetîkirin jî ya Ehmed Faiq e û bi vî awayî Ehmed Faiq du *Mem û Zîn* nivîsîne ku yek werger û yek jî nezîre ye (Tek 2017, r. 138). Ji bo girîngiya wê em dixwazin li vê derê mijarê vekin û qeneeta xwe îfade bikin. Bêguman jiyana *Aşiq Osman Sipkî* ku di beşa duyem a gotarê de dê cih bigire, li gor qeneeta ku em dê bigihinê dê bê nivîsîn. Bi gotineke dî ji bo ku nasnameya *Aşiq Osman Sipkî* derkeve holê, berî her tiştî divê pêwendîya wî û Ehmed Faiq bê ronîkirin ku ev yek ji bo mijara me xaleke heyatî ye.

Dema em li mijarê dinêrin, em dibînin ku nêrînen ku di vê biwarê de hatine îfadekirin dudu ne: Li gor nêrîna yekem *Aşiq Osman Sipkî* û Ehmed Faiq du kesayetên cuda ne, her yek ji wan xwediyê *Mem û Zîneke* bi tirkî ye û yê yekem mexlesa Nezmî û yê duyem jî mexlesa Faiq bi kar aniye (Toska 2015, r. 113; Öztürk 2017, r. 23). Li gor nêrîna duyem jî *Aşiq Osman Sipkî* û Ehmed Faiq heman kesayet in û vî kesî du *Mem û Zînên* bi tirkî nivîsîne. Ji van *Mem û Zînan* a yekem tercumeya *Mem û Zîna Xanî* ye û ya duyem jî telîf e ku bo *Mem û Zîna Xanî* wek nezîreyê hatiye nivîsîn. Muellif *Mem û Zîna Xanî* pêşî di sala 1856ê de tercumeyî tirkî kiriye, piştî 13 salan jî telîf/tenzîr kiriye. Di *Mem û Zîna* werger de mexlesên Faiq û Nezmî û di ya telîf de mexlesa Faiq bi kar aniye. (Tek 2017, r. 134-138). Eger em xulase bikin, li holê du *Mem û Zînên* tirkî yên cuda hene. Li gor nêrîna yekem yek ji wan ji aliyê *Aşiq Osman Sipkî* û ya dî jî ji aliyê Ehmed

Faiq ve hatine nivîsîn, lêbelê li gor nêrîna duyem her du jî aji aliyê Ehmed Faiq ve hatine nivîsîn.

Ji bo pêzanînê li vê derê em dixwazin li nusxeyên van her du Mem û Zînan jî binêrin: Ya ku li gor nêrîna yekem ji aliyê Aşîq Osmanê Sîpkî (Nezmî) ve hatiye nivîsîn û li gor nêrîna duyem wergera Ehmed Faiq e du nusxeyên wê hene: Nusxeyek jê li Tehranê li Kutubxaneyaya Meclisa Şûraya Millî di jimareya 9385an de tê parastin¹, nusxeya duyem jî di koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên kurdî de bi jimareya Kurd 38ê tê parastin. Ev Mem û Zîn ji aliyê Mustafa Öztürk (2017) û Ayhan Tek (2018) ve hatiye weşandin. Herçiqas ne mijara gotara me ye jî Mem û Zîna ku li gor her du nêrînan jî ji aliyê Ehmed Faiq ve wek telîf hatiye nivîsîn jî dîsa du nusxeyên wê hene. Yek jê li Stenbolê li Kutubxaneyaya “Suleymaniye”yê (Yazma Bağışlar, 894.35-1) û ya dî jî li Ankara li Kutubxaneyaya “Türk Tarih Kurumu”yê (Y.I. 165) tê parastin. Ev Mem û Zîn jî aliyê Sırrı Dadaşbilge ve hatiye weşandin (Faik 1969).

Îcar niha em dikarin li argumanên ku ji bo van nêrînan bûne palpişt binêrin. Bêguman em dê herî zêde argumanên nêrîna duyem ku du muellifên cuda wek kesayetekî qebûl dike analîz bikin. Gelo xwediyê vê nêrînê Tek di vê hizra xwe de xwe spartiyê çî? Di bersiva vê de em dikarin bibêjin ku Tek xwe spartiyê mexlesên ku di van her du Mem û Zînan de hatine bikaranîn. Li gor Tek di her du Mem û Zînan de ji aliyê mexlesan ve rewşeke weha heye: Di Mem û Zîna telîf de tenê mexlesa “Faiq” û di Mem û Zîna werger de jî carekê navê Osman, du caran mexlesa “Faiq” û 12 caran jî mexlesa “Nezmî” hatiye bikaranîn (Tek 134). Li gor Tek di Mem û Zîna telîf de bikaranîna yek mexlesî ku ew jî “Faiq” e bi awayekî aşkera nîşan dide ku ev Mem û Zîn a Ehmed Faiq e. Bi heman rengî ji ber ku di Mem û Zîna werger de jî mexlesa “Faiq” hatiye bikaranîn, ev Mem û Zîn jî dibe ya Ehmed Faiq. Heçî mexlesa “Nezmî” ye ew dikare wek mexlesa duyem a Ehmed Faiq bê qebûlkirin ku bikaranîna du mexlesan bi taybetî di nav kurdan de şêwazeke asayî ye (Tek 133-139).

Bêguman hebûna du mexlesan bo heman kesî tiştekî asayî ye, lêbelê bi baweriya me hebûna du kunyeyan bo kesekî ne tiştekî asayî ye. Li vê derê aşkera ye ku “Aşîq Osman Sîpkî” û “Ehmed Faiqê Bedlîsî” du kunyeyên cuda ne. Berî her tiştî navên wan cuda ne; yek Osman e û yê dî Ehmed e. Herweha nisbeyên wan jî cuda ne; Osman bo eşîra Sîpkîyan û Ehmed jî bo bajarê Bedlîsê hatine nisbetkirin. Bi baweriya me di vê rewşê de ya asayî ew e ku cudabûna kunyeyan cudabûna şexsan jî encam bidêre. Ji aliyê dî ve di Mem û Zîna Aşîq Osman Sîpkî de di beytekê de navê wî jî (Osman) derbas dibe ku ev yek di nisbetkirina berhemê de tu gumanan nahêle. Bi awayekî aşkera berhema ku tê de navê Osman derbas bibe ne pêkan e bo Ehmed Faiq bê nisbetkirin.

Eger em werin ser mijara beytên ku di wan de mexlesa “Faiq” derbas dibe ku argumana herî girîng a vê nêrînê ye, bi baweriya me, çawa ku Öztürk jî amaje pê kiriye (Öztürk 2017, r. 23), di van beytan de peyva “faiq” ne di pozîsyona

¹ Ji bo ku ev nusxe pêşkêşî me kir, em ji Hayrullah Acar re spasîyên ji dil pêşkêş dikin.

mexlesê de, bi wateya xwe ya ferhengî hatiye bikaranîn ku ew jî bilindî û raseriya ser tiştêkî ye. Di berhemê de bikaranînen peyva faiq bi vî rengê jêrîn in:

Ol padîşeh-i zaman-ı sabık
Gördü anı çün zamanda **faik**

Beg dedi ki siz görünce laik
Elbette bana da olsa **faik**

Bu Nazmiye sen olupsen üstad
Sözün ana **faik** oldu îcad

Dema mirov pê da diçe aşkera dibe ku di van beytan de peyvên “faiq” ne di pozîsyona mexlesê de, di wateya raseriyê de hatine bikaranîn. Ji ber ku Tek bi taybetî li ser beyta sêyem rawestiyaye (135), em ê jî teza xwe li ser vê beytê pratîze bikin. Li gor Tek di misraya duyem a vê beytê de (Sözün ana **faik** oldu îcad) “faiq” mexlesa helbestvan e û helbestvan di wê misrayê de xîtabî xwe kiriye û di misraya yekem a beytê de jî xîtabî Xanî kiriye. Li gor vê wateya beytê weha çê dibe: “(Ey Xanî) Ji ber ku tu ustadê vî Nezmîyî yî, ey Faiq gotinên te li ser bingeha yên Xanî hatin dahênan.” (Tek, 135). Lêbelê bi baweriya me li vê derê peyva “faiq” tenê di wateya xwe ya ferhengî de hatiye bikaranîn. Di vê rewşê de wateyeke weha li beytê dikeve: “(Ey Xanî) Ji ber ku tu ustadê vî Nezmîyî yî, gotinên te ser yên wî re hatine dahênan.” Bi baweriya me di şeweya yekem de ji aliyê rewanbêjiyê ve hinekî lengî jî derdikeve holê. Lewra dema di misraya yekem de xîtab ji bo kesekî cuda (Xanî) û di ya duyem de jî ji bo kesekî cudatir (faiq) tê kirin, di têgihştina beytê de zehmetî derdikeve holê ku ev li dijî regezên belaxetê ye. Lêbelê di şeweya duyem de tu lengî û zehmetiya têgihştinê tune ye. Bi kurtî li gor baweriya me di vê beytê de jî û di her du beytên pêşî de jî “faiq” ne mexles e. Di vê rewşê de jî mecal namîne ku berhem bo Ehmed Faiq bê nisbetkirin. Naxwe berhem ya Aşiq Osman Sîpkî ye ku hem navê wî, hem jî mexlesa wî (Nezmî) tê de hatiye bikaranîn. Herî dawî di vê biwarê de argumaneke dî ya ku em dixwazin bînin ziman ew e ku di tradîsyona edebiyata klasîk de ya standart ew e ku helbesetvanek berhemekê carekê telîf bike. Ev yek jî hizra ku Ehmed Faiq tenê Mem û Zînek nivîsiye bihêztir dike.

Eger em veşerî ser kojima jimara kesên ku di serdema klasîk de Mem û Zînên bi tirkî nivîsîne, cudahiya Aşiq Osman Sîpkî û Ehmed Faiq teqez dike ku jimara wan pênc e, ne çar. Niha li jêrê li ser esasê ku Aşiq Osman Sipkî kesayeteki cuda ye em dikarin derbasî beşa biyografîya Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî bibin.

2. ‘AKIFÊ WANÎ Û AŞIQ SİPKÎ

Dikare bê gotin ku vê kêliyê derheqê jiyana Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî de tekane çavkanî, têbîniyên A. Jaba yên destnivîs in ku derheqê berhemên destnivîs

ên ku di koleksiyona wî de cih digirin û nivîskarên wan berheman de nivîsîne. Jaba di nav van têbîniyan de beşeke serbixwe ji bo Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî terxan kiriye. Ev têbîniyên ku bi zimanê frensî hatine nivîsîn, di koleksiyona A. Jaba de di jimareya Kurd 54an de cih digirin (wr. 41a-43b). Li vê derê divê ev xal jî bê gotin ku agahiyên ku Jaba di van têbîniyan de dide di peydakirina çavkaniyên nû de jî dê rol bilîzin. Bi taybetî ji ber ku Jaba wezîfeyên burokratik ên Akifê Wanî bajar bi bajar pêşkêş kiriye, ev yek ji bo wî hêsantir e. Bi rastî jî di berhemeke bi navê *Bayezid Sancağı ve İdarecileri* (Karataş, 2014) de ku behsa rêvebirên sinceqa Bazîdê dike wek qeymeqamekî Bazîdê Akifê Wanî jî cih digire. Herçiqas di vê çavkaniyê de tenê behsa serdema rêvebiriya Wanî ya Bazîdê hatiye kirin jî, ev çavkanî ji bo me gelekî girîng e. Lewra ji aliyekî ve teserufên Wanî yên îdarî yên vê serdemê di çarçoveya belgeyên fermî de bi hûrgulî hatine tesbîtkirin, ji aliyekî dî ve jî hin xalên girîng ên bi jiyana wî ya giştî ve têkildar jî hatine dayîn. Bêguman eger Jaba behsa qeymeqamtiya Wanî ya Bazîdê nekiriba peydakirina vê çavkaniyê jî dê pir zehmet bûya. Ev jî girîngiya têbîniyên Jaba careke dî radixe ber çavan.

1.1. 'Akifê Wanî

Çawa ku li jorê jî hat gotin derheqê jiyana Akifê Wanî de di dest me de du çavkanî hene. Yek têbîniyên Jaba ne, ya dî jî berhema Karataş e. Ji ber ku têbîniyên Jaba hem tevahiya jiyana wî vedigire, hem jî derheqê Akifê Wanî de çavkaniya sereke ye, em dixwazin van têbîniyan li jêrê bi tevahî pêşkêş bikin² (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-42a):

“Akifê Wanî di tevahiya jiyana xwe de bi zimanên erebî, farisî û tirkî re mijûl bûye. Hafîzeyeke wî ya mezin hebûye û ji ber vê jî gelek helbestên helbestvanên navdar ji ber kirine. Xwendin û nivîsîna wî di van zimanan de gelekî baş bûye. Di demeke kurt de di nav kurdan de hatiye naskirin. Di bestekirina xezel û rubaiyan de şohreta wî çê bûye. Bi hêsanî kariye helbestan binivîse. Şohreta wî zû bala rêvebiran kişandiye. Loma jê re leqeba “efendî” hatiye dayîn. Di sala 1856an de bûye qeymeqamê Bazîdê. Li wê derê hizra nivîsîna helbestan bi zimanê tirkî pê re çê bûye û Mem û Zîna Xanî wergerandiye tirkî. Navê berhemê jî kiriye kulîlkên bêhnxeş ên evîne (Reyahîne ‘Eşq). Piştî ku 21 bend wergerandiye ji bo karên fermî ew gazî paytextê (Stenbol) kirine. Ji ber vê jî karê wergerê dide sekinandin û di nivî de dihêle. Yekemîn destkefta wî di warê berhemê de ew e ku di sala 1857an de dema derbasî Erzîrûmê dibe, wergera xwe pêşkêşî waliyê Erzîrûmê Xeyreddîn Paşa kiriye. Ew jî ji wergera wî gelekî kêfxweş bûye. Di navbera wan de hevaltî û dostaniyê dest pê kiriye. Hevaltiya wan gihaye wê astê ku walî keça xwe daye kurê Akifê Wanî Emîn Axa ku wê demê kesekî 18 salî û bê karûbar bûye. Akifê Wanî bi kurê xwe şanzî kiriye ku kurmancekî ji rêzê bûye “damad beg”. Piştî demekê Akifê Wanî bûye muteserîfê Batumê û di sala 1863yan de bêyî ku wergera xwe xilas bike li wê derê koçî dawî kiriye. Ez deyndarê wî me ku dema hatibû Erzîrûmê kopyayeke wê berhemê dabû min.”

² Ji bo ku têbîniyên Jaba ji zimanê frensî bo zimanê kurdî wergerandin, ez spasîya Şehab Welî û Yılmaz Özdil ferz dibînim.

Eger em van têbîniyan xulase bikin em dikarin bibêjin ku derheqê Jiyana Akifê Wanî de çar xalên girîng hatine dayîn. 1. Di ziman û edebiyatên erebî, farisî û tirkî de pispor e. 2. Şohreta wî pêşî li nav kurdan û piştî jî li nav rayedarên fermî yên Osmaniyan çê bûye. 3. Burokratekî girîng ê Osmaniyan e ku qeymeqamtî û muteseriftî kiriye. 4. Di 1863yan de koçî dawiyê kiriye. 5. Mem û Zîna xwe ya bi tirkî di sala 1856an de li Bazîdê nivîsiye.

Dema em li berhema ku behsa rêvebirên sinceqa Bazîdê dinêrin, berî her tiştî em dibînin ku di vê berhemê de kunyeya Akifê Wanî wek “Haci Mustafa Akif Efendî” hatiye dayîn. Ji vê jî em fêm dikin ku navê helbestvanê me ne ji Akif tenê pêk tê, di eslê xwe de helbestvanê me xwedî navekî murekkeb e ku ew jî Mustafa Akif e. Ji leqeba “haci” ku di kunyeya wî de cih digire em têdihigin ku Akifê Wanî bi mebesta îbadeta hecê sefera Hîcazê jî kiriye. Di dawiya kunyeyê de hebûna leqeba “efendî” paralelî agahiya Jaba ye jî. Di berhemê de serdema qeymeqamtîya Akifê Wanî ya Bazîdê wek 1856-1857 hatiye dayîn ku ev jî paralelî agahiya Jaba ye. Li gor berhemê Akifê Wanî li Wanê wezîfeya miftîtiyê jî kiriye û di sala 1845an de li ser vê wezîfê ye. Di esnayê vê wezîfeyê dema bûyera Bedîrxan Beg rû daye tercîha terefê dewletê kiriye û wê salê ketiye bin xizmeta dewletê û demên kurt li Maraş û Mûşê qeymeqamtî kiriye. Piştî demekê ketiye bin xizmeta leşkeriyê, lêbelê dîsa li Mûşê bûye qeymeqam û piştî Mûşê li Bazîdê dest bi qeymeqamtîyê kiriye (Karataş 2014, r. 150-155)

1. 2. Aşiq Osman Sipkî

Derheqê jiyana Aşiq Osman Sipkî de jî tekane çavkanî A. Jaba ye. Jaba di heman cihê de piştî ku behsa Akifê Wanî kiriye, derbasî Aşiq Osman Sipkî bûye. Agahiyên ku Jaba derheqê Aşiq Osman Sipkî de dide weha ne (Jaba, Kurd 54, wr. 42a-43b):

Aşiq Osman ji eşîra Sipkî ye ku eşîreke gelekî berbelav e. Niha li qezaya Eleşkirtê ku girêdayî Bazîdê ye dimînin û îro ji çend sed malbatan pêk tê û tê gotin ku belavbûyî û perakende ne. Sipkiyên ku ji eşîra xwe veqetiyane jiyaneke bêserûber derbas dikin. Ne bi qasî Akifê Wanî jî be, perwerdeya Aşiq Osman a farisî û tirkî gelekî baş bû. Bi xwendina xezelên Hafîz û stranên tirkî bûye helbestvanekî kurd. Di sala 1232 (1816/1817)an de hatiye Erzîrûmê û li wê derê dengbêjî kiriye. Waliyê Erzîrûmê Çapanoğlu ku kesayeteki bihêz û xwedî mal bûye, gelekî jê hez kiriye û li wê derê wek helbestvan û stranbêj ketiye bin xizmeta wî. Aşiq Sipkî li Erzîrûmê ji bo tirkan terka bikaranîna eşîra xwe (Sipkî) kiriye û navê “Aşiq Osman” bi kar aniyê. Çapanoğlu ewqas lê xwedî derketiye ku dewlemend bûye. Dewlemendiya wî gihaye wê astê ku herkesî xwestiye bibe hevalê wî. Di wê demê de kesekî ciwan e û ji halê xwe memnûn e. Lêbelê di dawiya jiyana wî de rewşa wî xirab bûye û ji bo helbestê hew îlham hatiyê. Hevalên wî yên li dora wî jî jê dûr ketine. Hemû pereyên xwe xerc kirine û veqetiyayê gundê xwe yê bi navê “Uznî” ku du saet dûrî Erzîrûmê bûye. Xweşbextane parçeyek erdê wî li wir hebûye. Li wir ji bo mirina hevalê xwe Akifê Wanî xemgîn bûye û dema li cîhana xwe ya derûnî veqetiyayê û ji bo mirina hevalê xwe giriye, hizra xilaskirina wergera nîvco û muhteşem ya Mem û Zîna Akifê Wanî pê re çê bûye. Werger di du salan de xilas kiriye û heman nav lê

kiriye. Lêbelê wergera Akifê Wanî ji ya wî xweştir e. Aşiq Sipkî xwestiye metnê hêsan bike, lêbelê Akifê Wanî xwestiye bi hevokên edebî û peyvên erebî û farisî ruhê mirov tetmîn bike. Lêbelê her du berhem jî bi qîmet in. Aşiq Osman piştî xilaskirina berhema xwe hêvî kiriye ku paşayekî wek Çapanoğlu peyda bike, berhema xwe pêşkêş bike û jê pere bistîne. Lêbelê bi ihtîmaleke mezin heta wê demê kes peyda nekiriye. Ji ber vê jî destûr nedaye ku kes berhema wi kopî bike. Gava ku min dê Erzirûm terk bikira piştî ku min çendîn soz danê ku ez belav nakim, min karî kopyayeke ku li pêş çavên min ji aliyê Aşiq Sipkî ve hat muqayesekirin jê bistînim.

Ji van zanyariyên ku ji têbîniyên Jaba tên bidestxistin nasnameya tarîxî ya Aşiq Osman Sipkî û biyografiya wî kêr zêde aşkera dibe. Bi saya wan em dikarin derheqê nasnameya wî de hin encaman bi dest bixin ku li jêrê hatine rêzkerin:

1. Navê wî Osman e. Di vê biwarê de divê bê gotin ku muellif di nav berhemê de jî navê xwe (Osman) bi kar aniye (Sipkî, Koleksiyona A. Jaba, Kurd 38, wr. 56a):

Mazhar ola lütf-ı Hakka her an

Mahrûm mekun tu ya Rab Osman

2. Ji eşîra Sipkan e ku navenda wan Elşekirt e û ji gundê Uznî ye ku dikeve aliyê Erzirûmê.

3. Întisabî tradîsyona edebiyata gelêrî ya tirkî kiriye. Em vê yekê ji leqeba “aşiq” a ku di kunyeya wî de cih digire fêm dikin. Leqeba “aşiq” bi du şeweyan dikare bê şîrovekirin. Ya yekem wek têgeheke tesewifî ew kes e ku tûşî evîna îlahî û tesewifî bûye, ya duyem jî wek têgeheke edebiyata tirkî ya gelêrî ew helbestvanê gel e ku digel helbestan li sazê dixê. Herçiqas wek helbestvanekî serdema klasîk aşiqbûna mellifê me di wateya yekem de pêkan jî be, ji zanyariyên Jaba em têdigihin ku aşiqbûna wî di wateya duyem de ye. Lewra Jaba dibêje ku bûye dengbêjê Waliyê Erzirûmê Çapanoğlu û li wê derê dest bi bikaranîna navê “Aşiq Osman” kiriye. Ji aliyê dî ve em dizanin ku ev tradîsyona edebiyata tirkî li devera serhedê bi hêz e. Ev tev nîşan didin ku helbestvanê me bûye endamekî çanda aşiqan a edebiyata tirkî û di vê qonaxê de xwe wek Aşiq Osman daye nasandin.

4. Hevalê Akifê Wanî ye, lêbelê piştî wî koçî dawiyê kiriye. Ji agahiyên ku Jaba dide em têdigihin ku Sipkî dema di sala 1816an de çûye Erzirûmê ciwan e û dema di sala 1866-1867ê de wî û Jaba hev dîtine pîr bûye. Ji ber ku navbera her du tarîxan beramberî 50 salî tê, dikare bê texmînkirin ku dema çûye Erzirûmê di temenê 15-20 salî de ye. Dema em van salan jî li 50î zêde bikin temenê wî dibe 65-70 sal. Bêguman em nikaribin payan bikin jî, ew piştî dîtina Jaba jî (1866-1867) demekê jiyaye. Loma em dikarin bibêjin ku wî di çaryeka sêyem a sedsala XIXem de di temenê xwe yê raserî 70 salî de koçî dawiyê kiriye.

Di biwara serdema wî de em doneyekê jî ji berhema wî bi dest dixin. Lewra wî di dawîya berhema xwe de bi hesabê ebcedê tarîxa te'lîfa berhemê daye. Ji ber ku tarîxa te'lîfa berhemê di heman demê de serdema nivîskar jî nîşan dide ev xaleke girîng e. Beyta ku tê de bi hesabê ebcedê tarîxa te'lîfa berhemê hatiye dayîn ev e (Sipkî, Koleksiyona A. Jaba, Kurd 38, wr.59a):

*Tarîx-i kitaba tam oldi**Bu sözüme can xitam buldı*

Di vê beytê de nivîskar dibêje ku “Tarîxa nivîsîna berhemê tam çê bû: Ey can! Ev gotina min gihîşt dawiyê.” Ji îfadeya “*tarîx-i kitaba*”ya risteya yekem a vê malikê em têdigîn ku nivîskar di vê malikê de tarîxa te’lîfa berhemê dide. Dema mirov malikê vedikole, derdikeve meydanê ku tarîx ji risteya duyem a beytê pêk tê: (بو سوزمه جان ختام بولدی / Bu sözüme can xitam buldı). Çawa tê zanîn di hesabê ebcedê de herfên ku bi elîfbêya erebî hatine nivîsîn jimarên diyarkirî nîşan didin û bi komkirina van jimarên tarîx derdikeve meydanê. Li jêrê yek yek herfên risteya duyem û di çarçoveya hesabê ebcedê de bergîndên wan ên jimarî û encama hesabê ebcedê hatine dayîn:

ب	و	س	و	ز	م	ه	ج	ا	ن	خ	ت	ا	م	ب	و	ل	د	ی
6	6	60	6	7	40	5	3	1	50	600	400	1	40	2	6	30	4	10

بو سوزمه جان ختام بولدی = 1273 (1856-1857)

Çawa tê dîtin komkirina van jimarên encama 1273ê derdixwe meydanê ku ev jî beramberî 1856-1857a mîladî tê. Bêguman bidestxistina vê tarîxê tiştê gelekî girîng e. Lewra çawa me got tarîxa nivîsîna berhemê serdema nivîskar jî nîşan dide. Ji vê tarîxê bi awayekî aşkera derdikeve meydanê ku ‘Aşiq Sipkî berhema xwe di sala 1856-1857ê de nivîsiye û di wê demê de li heyatê bûye ku ev zanyarî jî bi agahiyên Jaba re hevgirtî ye.

3. MEM Û ZÎNÊN ‘AKÎFÊ WANÎ Û ‘AŞIQ OSMAN SIPKÎ

Di vê beşê de em dê di çarçoveya zanista destnivîsariyê de li ser her du nusxeyên destnivîs ên Mem û Zînên tirkî ku di koleksiyona A. Jaba de cih digirin analîzeke kodîkolojîk bikin. Lêbelê berî ku em yek yek her du nusxeyan analîz bikin, em dixwazin di serî de ji bo xaleke ku bi her du nusxeyan re têkildar e sernavekî serbixwe vekin ku ew jî bikaranîna navekî taybet e di her du nusxeyên koleksiyona A. Jaba de.

3. 1. Navlêkirineke Taybet: “Riyazê ‘Eşq”

Taybetiyeke sereke a her du Mem û Zînên tirkî yên koleksiyona A. Jaba ew e ku her du jî şûna ku hevterîbê mijara xwe wek “Mem û Zîn” bên binavkirin bi navekî taybet hatine binavkirin. Di vê biwarê de xaleke dî ya balkêş ew e ku di xwendina vî navê ku bi elîfbêya Osmanî hatiye nivîsîn de di nav lêkolîneran de hevgirtinek çê nebûye û ev nav bi du şeweyan hatiye xwendin: “Reyahînê Eşq” û “Riyazê ‘Eşq”

Çi “Reyahînê Eşq”, çî “Riyazê ‘Eşq” be, aşkera ye ku ev navlêkirineke taybet e û bi qasî ku taybet e balkêş e jî. Lewra di tradîsyona edebiyata klasîk a Rojhilata Îslamî de berhemên ku li ser dastanên evîndariyê hatine nivîsîn, bi piranî bi navên pehlewaniyê çîrokê hatine binavkirin. Wek dastanên Leyla û Mecnûn, Yûsif û Zuleyxa, Ferhad û Şîrîn û Mem û Zînê. Ev yek hem di edebiyatên erebî, farisî û kurdî de, hem jî di edebiyata tirkî de wisa ye. Ji ber vê ye ku di van her du Mem û Zînên tirkî de ev şewaza cuda di navlêkirinê de wek xaleke enteresan û balkêş derdikeve pêş. Bivênevê li vê derê hin pirs divê

bên pirskirin: Gelo çima di navlêkirina van berheman de serî li şêwazeke cuda û derî tradîsyonê hatiye dayîn? Digel ku navê eslê berheman “Mem û Zîn” e, çima di tercumeyan de rîayetî navê eslî nehatiye kirin? Gelo muellifan bixwe serî li vê şêwaza cuda dane, yan dibe ku piştî wan hin kesên dî serî lê vê şêwazê dabin?

Berî her tiştî divê em bizanin ku Mem û Zînên tirkî yên ku di koleksiyona A. Jaba de cih nagirin di vê mijarê de ji yên ku di koleksiyonê de cih digirin vediqetin. Lewra hem di Mem û Zînên Ehmed Faiq, Ebdulezîz Xalis û Zulfîqar Fethî de, hem jî di Mem û Zîna Aşiq Sipkî nusxeya Tehranê de ku ev tev derî koleksiyona A. Jaba ne, di navlêkirinê de serî li şêwazeke weha nehatiye dayîn û ji bo berheman navê Mem û Zînê hatiye bikaranîn. Loma bikaranîna navekî cuda wek taybetiyeke Mem û Zînên tirkî yên koleksiyona A. Jaba derdikeve pêş. Yanî sebebê vê navlêkirinê ne ew e ku Mem û Zîn bi tirkî ne, sebebê wê ew e ku ev Mem û Zîn di koleksiyona A. Jaba cih digirin. Îcar li vir tiştta ku divê bersivê jê re bê dîtin ev e: Gelo ev navlêkirin bi taserufa berhevkarên koleksiyona A. Jaba çê bûye, yan bi awayekî dî? Ji bo bersiva vê pirsê divê mirov berê xwe bide nusxeyên dî yên her du Mem û Zînên koleksiyona A. Jaba. Lewra di nusxeyên dî de hebûn û nebûna vî navî di ronkirina mijarê de dê roleke girîng bilîze. Bêguman ji bo vê yekê hebûna nusxeyên dî û bidestxistina wan girîngiyê bi dest dixê. Vê kêliyê em ji tu nusxeyên dî yên Mem û Zîna Akifê Wanî ne haydar in û tenê ji nusxeyeke dî ya Mem û Zîna Aşiq Sipkî haydar in ku ew jî nusxeya Tehranê ye. Dema em di biwara navê berhemê de li vê nusxeyê dinêrin em dibînin ku tê de wek hemû Mem û Zînên derî koleksiyona A. Jaba navê Mem û Zînê hatiye bikaranîn (Sipkî, 1273, wr. 1b). Bêguman ev xal ji bo ronkirina mijarê gelekî girîng e. Li gor vê em nikarin piştrast bikin ku Aşiq Sipkî bixwe berhema xwe bi navekî taybet bi nav kiriye. Lewra ji her du nusxeyan a ku navê “Riyazê ‘Eşq”ê tê de nehatiye bikaranîn ji ya ku tê de hatiye bikaranîn kevintir e. Di rewşên weha de jî bi awayekî siruştî nusxeyên kevin esas tên girtin. Ji aliyekî dî ve çawa ku li jêrê em dê behs bikin ev nusxe bi ihtîmaleke mezin nusxeya muellif bixwe ye ku di dijberiyên nusxeyan de her dem nusxeya muellif esas tê girtin (Eşîlan, 1994, r. 131-134). Ev tev nîşan didin ku ev navlêkirina taybet ne ji eslê berhemê ye, taserufeke ku piştê hatiye kirin ku ev jî bivênevê berê me dide koleksiyona A. Jaba.

Em dê ji bo çareserkirina vê pirsgerêkê ji têbîniyên Jaba û taybetiyên her du destnivîsan sûd wergirin. Jaba di vê biwarê de dibêje ku pêşî Akifê Wanî navê “Reyahîne Eşq” li berhema xwe kiriye, piştê Aşiq Sipkî jî wek wî heman nav li ya xwe kiriye (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-43b). Li gor ku jaba dibêje dema Akifê Wanî di sala 1857an de hatiye Erzîrûmê kopyayek ji Mem û Zîna xwe daye wî ku nusxeya Mem û Zîna Akifê Wanî ya ku di koleksiyona A. Jaba de cih digire ev e. Dîsa ji agahiyên Jaba em têdigihin ku nusxeya Mem û Zîna Aşiq Sipkî di sala 1867an de hatiye istinsaxkirin. Yanî istinsaxa nusxeya Akifê Wanî 10 salan berî ya Aşiq Sipkî ye ku ev yek ji kaxezên destnivîsan jî dikare bê çavdêrîkirin. Ji ber ku navê berhemê

ku di serlewheya Mem û Zîna Akifê Wanî de hatiye nivîsîn ji aliyê kalîgrafîk ve bi tevahî wek kalîgrafiya berhemê ye em têdigihin ku ev nav ji orjînalê berhemê ye û ji ber ku muellif bixwe ev nav bi kar aniye di kopyaya wê de jî cih girtiye. Dema em di her du nusxeyan de bi awayekî berawirdî li navên wan dinêrin dîmenekî weha li pêşberî me ye: Navê berhemê di zehriyeya nusxeya Akifê Wanî de û di zehriye û serlewheya nusxeya Aşiq Sipkî de bi heman kalîgrafiye hatiye nivîsîn ku ev kalîgrafî ji kalîgrafiya metnên her du berheman cuda ye. Ji vê jî tê fêmkirin ku Jaba zehriyeyek ji nusxeya Akifê Wanî re amade kiriye/daye amadekirin û heman navê berhemê ku di serlewheyê de heye di zehriyeya wê de jî nivîsiye/daye nivîsîn. Piştê jî dema zehriye û serlewhe ji ya Sipkî re amade kiriye, heman nav li wan deran jî nivîsiye/daye nivîsîn. Yanî digel ku di nusxeya orjînal a Mem û Zîna Aşiq Sipkî de tune, xebatkarên koleksiyona A. Jaba navê nusxeya Akifê Wanî li wê jî kirine. Sebebê vê jî aşkera ye. Çawa di biyografiya muellifan de jî hat gotin Jaba her du muellif wek heval dane nasandin, nivîsîna Mem û Zîna Aşiq Sipkî bi mirina Akifê Wanî ve girê daye û Mem û Zîna Aşiq Sipkî wek dewama Mem û Zîna Akifê Wanî li qelem daye. Ji ber vê yekê jî bi awayekî siruştî heman navê Mem û Zîna Akifê Wanî li ya Aşiq Sipkî jî kiriye.


Bêguman li vê derê ev pirs dê bê pirsînin: Gelo dema Aşiq Sipkî nusxeya kopyakirî kontrol kiriye mudaxele yê wê yekê nekiriye? Lewra di esnaye kontrolê de eger ev nav dîtibe pêwîst e îtirazî wê desttêwerdanê kiribe. Bêguman ev pirs gelekî di cih de ye, lêbelê bersiva wê jî gelekî hêsan e. Çawa me got kalîgrafiya metnê berhemê bi şeweyekê û ya zehriye û serlewheya wê bi şeweyekê di ye. Ji vê jî tê fêmkirin ku zehriye û serlewhe piştê jî aliyê xebatkarên koleksiyona A. Jaba ve hatine amadekirin. Yanî ji ber ku piştî kontrola muellif (Aşiq Osman sipkî) di zehriye û serlewheyê de heman navê Mem û Zîna Akifê Wanî hatiye nivîsîn ku li jorê behsa sedemê wê hat kirin, muellif tenê metnê berhemê kontrol kiriye û bi awayekî siruştî rastî desttêwerdaneke ku pey wî re hatiye kirin nehatiye.

Di vê mijarê de xala dî ya ku em dixwazin li ser rawestînin, şaşiyek e ku ji aliyê Jaba ve di xwendina vî navê taybet ê mewzûbehs de hatiye kirin ku ev şaşî di eslê xwe de ji aliyê Ayhan Tek ve hatiye tesbîtkirin (Tek, 2017, 142). Dema em lê dinêrin em dibînin ku Jaba di nav xebatên xwe de kalîgrafiya vî navê taybet bi şaşî wek “Reyahînê ‘Eşq” (رياحين عشق) xwendiyê û latînîze kiriye. Kakila wê şaşiyê ew e ku ravebera terkîbê ku “riyaz” e wek “reyahîn” hatiye xwendin. Herçiqas ev şaşî cara pêşî ji aliyê A. Jaba ve hatiye kirin jî, wê dawiyê ji aliyê Mustafa Öztürk ve jî hatiye dubarekirin û berhema ku ji latînîzekirina metnê Mem û Zîna Aşiq Sipkî pêk tê ji aliyê Öztürk ve her bi şeweya “Reyahînê ‘Eşq”ê hatiye weşandin. Bêguman ji ber ku ev şaşî bi wê xebata Öztürk bûye malê raya giştî, mijar analîzeke bi hûrgulî heq dike.


Dema em taybetiyên asayî yên îmlaya wê terkîbê li ber çavan digirin, bi hêsanî tê dîtî ku xwendina bi şeweya “Reyahînê ‘Eşq” şaş e. Çawa ku Ayhan Tek jî amaje pê kiriye (Tek, 2017, 142), ji bo ku “reyahîn” be, pêwîst e di peyvê de herfa “yê”

du caran hatiye nivîsîn. Lêbelê di nav her du nusxeyan de li her çar cihên ku ev peyv hatiye bikaranîn herfa “yê” tenê careke hatiye bikaranîn. Li vir divê bê gotin ku ji bilî van çar cihên ku Tek jî amaje pê kiriye, di têbîniyên Jaba de jî ev nav du caran hatiye nivîsîn û di van her du cihan de berevajî her du nusxeyan herfa “yê” hatiye bikaranîn. Bi gotineke dî di van her du cihan de raveber tam li gor “reyahînê” hatiye nivîsîn. Bi baweriya me li vê derê kirasê heqîqetê li şaşiyê hatiye kirin û nivîs li gor xwendina şaş hatiye nivîsîn. Bi vî awayî du îmlayên navê berhemê derketine meydanê. Ji bo ku ev yek bê fêmkirin em dixwazin bi hûngulî li îmlaya raveberê binêrin. Çawa tê zanîn di destnivîsên bi elîfbêya erebî de herfa ض/Dad’ê ku di dawiya peyva “Riyazê” (رياض)ê de jî heye bi îmlayeke taybet tê nivîsîn. Pêşî giroverek, piştî wê niqirkek û piştî wê jî dûvikekî şikestî (şibhê~) tê xêzkirin. Îcar Jaba ev her sê hêmanên herfa ض/Dad’ê bi şaşî wek sê herfên cuda hizir kirine û grovera ض/Dad’ê wek ح/Ha, niqirka ض/Dad’ê wek ی/Ye û dûvikê wê jî wek ن/Nûn xwendine. Di encama vê de herfa ض/Dad’ê ku di dawiya peyva “Riyazê” (رياض)ê de cih digire, şûna ku tenê rola herfekê hilgire ser milê xwe, rola sê herfan hilgirtiyê ser milê xwe û bi vî awayî bûye “رحین” . Piştî dema “رحین” li herfên berî wê ku ر/Re û ی/Ye ne hatiye zêdekirin peyva “reyahîn”ê derketiyê meydanê. Lêbelê piştî di têbîniyan de peyva “reyahînê” bi awayekî dirust hatiye nivîsîn.


Niha jî em dixwazin li wêneyên orjînal ên raveberê binêrin û di çarçoveyan van wêneyan de îmlaya orjînal a peyvê analîz bikin. Li jêrê di wêneyên navên berhemê yên her du nusxeyan de aşkera tê dîtin ku di navê berhemê de raveber ku ji milê rastê peyva yekem e (Riyaz/ رياض), bi herfa ض/Dad’ê diqede, ne bi hêceya bi “رحین”ê. Bi gotineke dî cihê ku wek “رحین” hatiye xwendin herfa ض/Dad’ê ye. Lewra pêşî grovera ض/Dad’ê, piştî niqirka wê, her dawî jî dûvikê wê tê. Çawa li jorê jî hat îzahkirin navê ku di serlewheya Mem û Zîna Akifê Wanî de cih digire orjînal (Wêne 1), yên dî piştî li ber wê hatine nivîsîn. Ev taybetiyên kalîgrafîk di wêneyan de bi hêsanî dikarin bîn dîtin:




2. Riyazê Eşqa Akifê Wanî, Kurd 39, berg. Kurd 39, 2a.



1. Riyazê Eşqa Akifê Wanî, serlewhe




4. Riyazê Eşqa Aşiq Sîpkî, Kurd 38 berg. 1a, serlewhe.




3. Riyazê Eşqa Aşiq Sîpkî, Kurd 38

Nîşaneyeke dî ya vê rastiyê jî ew e ku peyva “Riyazê” (ریاض)ê li cihên dî yên berhema Akifê Wanî de jî bi heman taybetiyên kalîgrafîk ên ravebera navê berheman hatiye nivîsîn. Bo nimûne di terkîba “riyazê cennet” de ev yek dikare bê şopandin (Wêne 6). Eger di ravebera navê berhemê de xwendina bi şeweya “reyahîn” pêkan be, divê ev terkîba jêrîn jî bi şeweya “reyahîne cennet” bê xwendin ku ev ne pêkan e. Dîsa ji ber ku dawîya “ریاحین/reyahîne” bi “yê” û “nûn”ê diqede, pêwîst bû wek “sensin”a ku di Wêne 5’de bi “yê” û “nûn”ê diqede bihata nivîsîn.




6. Riyazê Eşqa Akifê Wanî, Kurd 39 wr. 41.




5. Kurd 38 1a, destpêk.

Li jêrê jî wêneyên navên berhemê yên ku di têbîniyên Jaba de hatine nivîsîn cih digirin. Çawa tê dîtin di van her du cihan de du cara herfa “yê” hatiye bikaranîn. Yanî peyv li gor “reyahîne” hatiye nivîsîn. çawa li jorê jî me got nivîs li gor xwendina şaş hatiye nivîsîn.



8. Kurd 54 w 41b.



7. Kurd 54 w 42a.

Bi kurtî hat fêmkirin ku Akifê Wanî navê “Riyazê ‘Eşq” (ریاض عشق)ê li Mem û Zîna xwe kiriye. Lêbelê ew nav ji aliyê xebatkarên koleksiyona A. Jaba ve bi şaşî wek “Reyahîne ‘Eşq” (ریاحین عشق) hatiye xwendin. Ji ber ku xebatkarên koleksiyona A. Jaba heman nav li Mem û Zîna Aşiq Sîpkî jî kirine, li ser nusxeya wî jî heman şeweya kalîgrafiyê bi kar anîne. Lêbelê piştî dema di nav têbîniyên Jaba de behsa navê berhemê hatiye kirin kalîgrafiyê li gor xwendina şaş (reyahîn) derketiye meydanê.

3. 2. Riyazê ‘Eşqa ‘Akifê Wanî

3. 2. 1. Danasîna Nusxeyê

1. Navê berhemê : *Reyahîne ‘Eşq [Riyazê ‘Eşq]*
2. Te’lif, tercume, şerh : Te’lif

3. **Navê nivîskar** : 'Akifê Wanî
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Lenîngrad, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. **Koleksiyon** : Koleksiyona A. Jaba
7. **Pirtûkxane no** : Kurd 39
8. **Navê xwedî** : [A. Jaba]
9. **Zimanê destnivîsê** : Tirkîya Osmanî
10. **Taybetiyên bergê** : Wêneyên rûyên derve yên bergê nehatine kişandin, lêbelê yên rûyên hundir hatine kişandin. Li gor rûyê hundir ê bergê bi kazeke sipî hatiye rûkirin û bi kenaran ve jî çermekî reş hatiye zeliqandin. Ji vê jî tê fêmkirin ku rûyê derve yê bergê bi çermekî reş hatiye rûkirin.
11. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
12. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
13. **Zehriye** : Heye. Bi tirkîya Osmanî nav berhemê û bi frensî têbîniyên Jaba cih digirin.
14. **Rengê kaxezê** : Zer
15. **Rizîbûna kaxezê**: Kaxez ne rizî ye.
16. **Jimara wereqan**: 38 wereq in. Lêbelê di dawiyê de 36b, 37a û 37b vala ne.
17. **Ebadên kaxezê** : 35x22 (Ji têbîniyên arşîva A. Jaba)
18. **Cureya xetê** : Riq'e
19. **Îmla** : Îmlaya wê xweş e û xwendinbar e.
20. **Murekkeb** : Di tevahiya nivîsê de murekkeba reş hatiye bikaranîn.
21. **Cedwel** : Li dora rûpel cedwel nehatiye xêzkirin. Tenê di navbera her du sitûnan de xêzeke emûdî hatiye kişandin.
22. **Jimara beşan** : 21
23. **Sernav** : 21 sernav hene. Lêbelê ev sernav ne bi naveroka beşan re têkildar in, derheqê jimarebendiyê de ne.
24. **Jimara beytan** : 939
25. **Jimara rêzan** : 14
26. **Jimara sitûnan** : Di her rûpelî de du sitûn hene.
27. **Destpêka destnivîsê** : "*Bend-i Evvel. Sername-yi aşk(t) nam-ı Allah / Mahbûb-i qulûb-i kull heva-yi ah*" (wr. 2a).
28. **Dawiya destnivîsê** : "*Gam kaldı heman enîs û yarî / Gam ile musahebeti kari*" (wr. 36a).

3. 2. 2. Nirxandina Nusxeyê

Çawa tê zanîn nixê nusxeyekê bi arîkariya krîterên wek tambûn, dêrînî, fêambarî û hebûna teshîhan derdikeve holê (Bergsträsser, 2011, r. 1; Esîlan, 1994, r. 131-134). Em ê jî hewl bidin ku di vê beşê de di çarçoveya van pîvanan de li ser nusxeya Mem û Zîna Akifê Wanî ya di koleksiyona A. Jaba de nirxandinekê bikin û nixê nusxeyê derxin holê. Bêguman ev yek di çarçoveya tabloya tewsîfa nusxeyê de dê bê kirin ku di beşa jorîn de hatibû pêşkêşkirin.

Çawa ku di biyografiya Akifê Wanî de jî hat îzahkirin, muellif nekariye Mem û Zîna xwe ya tirkî xilas bike û ev berhema Zîna xwe nivco hiştiye ku tenê 21 beş tê de hene. Ji ber wê jî ev nusxeya ku di koleksiyona A. Jaba de cih digire nivco ye,

yanî ne tam e. Di dawiyê nusxeyê de qeyda istinsaxê tuneye ku ev ji bo berhemeke nîvco tişteki asayî ye. Ji ber vê jî cih û zemanê istinsaxê, herweha navê mustensix jî nayên dîtin. Lêbelê dema em li agahiyên Jaba dinêrin, ev xalên tarî li ber me ron dibin. Li gor van agahiyên Akifê Wanî di sala 1856an de dema li Bazîdê qeymeqam bûye ev Mem û Zîn nivîsiye û dema di sala 1857an de hatiye Erzîrûmê nusxeyek jê daye Jaba (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-43b). Ji vê agahiyê em têdighin ku ev nusxe ne nusxeya muellif e, lêbelê li ber ya muellif hatiye istinsaxkirin û sala istinsaxa wê jî 1857 e. Ji ber ku nusxe li ber nusxeya muellif hatiye zêdekirin nusxeyeke girîng e. Herweha ji aliyê dêrîniyê ve jî wek nusxeyeke kevin dikare bê qebûl kirin. Xaleke dî ya ku divê bê gotin ew e ku zehriyeya nusxeyê ne ji aliyê mistensixê nusxeyê ve, piştî ji aliyê xebatkarên koleksiyona A. Jaba ve hatiye amadekirin. Ev yek ji cudahiya kaxez û kalîgrafiya wan tê fêmkirin. Îmlaya nusxeyê jî xweş e, loma jî ji aliyê fêmbariyê ve di asteke baş de ye.

Nusxe, ji aliyê hin taybetiyên standart ên destnivîsan û hunerên ku li ser kaxezên destnivîsan tînin îcrakirin ve gelekî lawaz e. Di nusxeyê de Besmele, serlewhe, cedwel û peyvên te'qîbê tunene. Jimarên rûpelan ne li gorî sîstema wereqan, li gorî sîstema rûpelan li jora rûpelan hatine nivîsîn. Yanî wereq 2a wek 1, wereq 2b wek 2 hatine jimarekirin. Herweha di jimarebendiyê de zehriye nehatiye hesibandin. Di navê vê sîstemê de berhem ji 69 rûpelan pêk hatiyê. Lêbelê piştî li jêra rûpelan li gorî sîstema wereqan bi qelemzîreçê ji nû ve jimare hatine dayîn û ji zehriyeyê hatiye destpêkirin. Li gorî ve berhem di 36a'yê de diqede. Aşkera ye ku ev sîstema jimareyê ya dirust yan ji aliyê xebatkarên koleksiyona A. Jaba, yan jî piştî wan bi ihtîmaleke mezin ji aliyê Rudenko ve hatiye kirin ku katloga koleksiyona A. Jaba ji aliyê wê ve hatiye weşandin.

Ev nusxe herçiqas ji aliyê fêmbarî û dêrîniyê ve nusxeyeke baş e jî, nivcobûna wê wek kêmasiyeke pir mezin derdikeve pêş. Xweşbextane ji daneyên dîtir dem û cihê istinsaxê tînin zanîn. Nusxe digel hemû kêmasiyên xwe di çarçoveya zanyariyên berdest de tekane nusxeya Mem û Zîna Akifê Wanî ye, loma jî xwedî girîngiyeke mezin e.

3. 3. Riyazê 'Eşqa 'Aşiq Sipkî

3. 3. 1. Danasîna Nusxeyê

1. Navê berhemê : Riyazê 'Eşq
2. Te'lîf, tercume, şerh : Te'lîf
3. Navê nivîskar : 'Aşiq Sipkî
4. Cih (bajar û dewlet) : Lenîngrad, Rûsya
5. Navê Pirtûkxaneyê : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. Koleksiyon : Koleksiyona A. Jaba
7. Pirtûkxane no : Kurd 38. Ev jimare hem li ser klasora arşîva A. Jaba, hem jî li ser rûpelê hundir yê bergê hatiye nivîsîn.
8. Zimanê destnivîsê : Tirkî

9. **Taybetiyên bergê** : Ji ber ku wêneyê bergê nehatiye kişandin taybetiyên bergê ne aşkera ne. Lêbelê li gor wêneyên dijîtal berg jî ji cinsê kakeza berhemê ye.
10. **Serbixwe-mecmû'e** : Berhem serbixwe ye û ne di nav mecmû'eyekê de ye.
11. **Tarîxa telîfê** : 1283 (1866-1867)
12. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
13. **Zehriye** : Li ser zehriyeyê bi Frensî ev îfade heye:
14. **Rengê kaxezê** : zera vekirî
15. **Te'mîra kaxezê** : Di 58b û rûpelê dawî de cihekî qetandî bi bendeke şeffaf hatiye te'mîrkirin.
16. **Jimara wereqan** : 59 wereq in.
17. **Ebadên kaxezê** : 35x 22 (Ji têbîniyên arşîva A. Jaba).
18. **Cureya xetê** : Riq'e
19. **Îmla** : Îmlayeke xweş e û bê hereke ye. Tenê di hin cihan de murekkeba nivîsê hinekî belav bûye, yan jî rijiyaye, lêbelê peyv tên xwendin. Bo nimûne di wereq 22b'yê de di misraya dawî de "qatdi canin", di wereq 53b2yê de "qebrine çûn" û di wereq 56 b'yê de "pîr dedikî bana oldu" 58b "elden ele"
20. **Murekkeb** : Di tevahiya destnivîsê de tenê murekkeba reş hatiye bikaranîn.
21. **Cedwel** : Li dora rûpelan cedweleke çarkoşe ya sitûnî hatiye xêzkirin. Herweha di nav vê cedwelê de jî du cedwelên sitûnî hatine bicihkirin. Yek ji wan jî bo misrayên yekem, ya dî jî ji bo misrayên duyem ên menzûmeyê ne. Cedwel, heta bi 24 b'yê yekxêzî, ji 25a'yê şûnde duxêzî ye. Hin xêz derketine derve, hin xêz jî xwehr in. Li sêçar cihan beytên dawî li ser cedwela jêrîn hatine nivîsîn.
22. **Jimara beşan** : 41 beş in.
23. **Sernav** : 40 sernav hene. Beşa yekem bê sernav e. Sernav jî wek metnê bi murekkeba reş hatine nivîsîn. Sernav bi farisî ne.
24. **Jimara beytan** : 1923
25. **Jimara rêzan** : Di çarçoveya rûpelên tam tijî de piraniya rûpelan jî 17 rêzan (beytan) pêk hatine. Bi qasî 20 rûpelan jî 18 rêzan û rûpelek jî (wr. 25a) jî 16 rêzan pêk hatiye.
26. **Jimara sitûnan** : Hemû rûpelên berhemê jî du sitûnan pêk hatine.
27. **Peyva te'qîbê** : Peyva te'qîbê bi piranî tune. Tenê li pênc cihan peyva te'qîbê hatiye nivîsîn (wr 12b, 24b , 36b û 46b, 58 b).
28. **Qeyda istinsaxê** : "Temmet el-Kitab bi 'ewni'llah el-melik el-wehhab senet 1283." (Kitêb bi arîkariya Xudayê melik û wehhab di sala 1283yan de tamam bû.) (wr. 59a).
29. **Tarîxa istinsaxê** : 1283 (1866-1867).
30. **Teshîh** : Li ser destnivîsê hin teshîh hatine kirin.
31. **Hamiş/derkenar** : Di wereq 46b'yê de du peyvên ku di wan de herfa herfa "Nûn"ê wek tevahiya menzûmeyê bi îmlaya riq'eyê hatiye nivîsîn (sen û lebin), li derkenarê di kêleka beytan de li gor îmlaya nesxê bi "Nûn"ên vekirî hatine nivîsîn.
32. **Destpêka destnivîsê** : "Sername-yi name ism-i Allah / İsmi ile her iş tamam vallah" (wr. 2a).
33. **Dawiya destnivîsê** : "Tarîx-i kitabe tam oldı / Bu sözüme can xitam buldu" (wr. 59a).

3. 3. 2. Nirxandina Nusxeyê

Em dê di bin vî sernavî de jî hewl bidin ku ji aliyê krîterên standart ve Mem û Zîna Aşiq Sipkî nusxeya koleksiyona A. Jaba binirxînin. Dema em ji aliyê tambûnê ve li nusxeyê dinêrin, em dibînin ku nusxeya destnivîs a Mem û Zîna Aşiq Sipkî ku di koleksiyona Jaba de cih digire nusxeyek tam e. Ev nusxe ji zehriyeyê (wr. 1a) heta bi wereqa dawî (wr. 59a) ku tê de qeyda istinsaxê cih digire bê kêmasî gihîştîye roja me. Bi awayekî siruştî di nusxeyên tam de di zehriye û wereqa dawî de zanyariyên girîng cih digirin. Di vê nusxeyê de jî li ser zehriyeyê navê nivîskar ('Aşiq Sipkî) û navê berhemê (Riyazê 'Eşq) û di qeyda istinsaxê de jî tarîxa istinsaxê hatiye dayîn (1283). Ev nusxe ji aliyê tambûnê û hebûna van zanyariyan ve nusxeyeke binirx e.

Ji aliyê qeyda istinsaxê ve divê bê gotin ku di vê qeydê de zanyariyên wek cihê istinsaxê, yan jî yên derheqê nasnameya mustensix de nehatine dayîn, lêbelê qet nebê di vê qeydê de tarîxa istinsaxê cih digire. Herçiqas qeyda istinsaxê ne tekûz e jî, hebûna tarîxa istinsaxê ji bo me girîng e. Lewra ev yek ji bo tesbîtkirina temenê nusxeyê û herweha dêrîniya nusxeyê doneyeke girîng dide destê me.

Ji bo ku em dêrîniya nusxeyê binirxînin, em dê hem ji tarîxa istinsaxê ya nusxeya Jaba, hem jî ji tarîxa te'lîfa berhemê ku di beyta dawî ya berhemê de bi hesabê ebcedê hatiye dayîn (bnr. beşa biyografiya Aşiq Osman Sipkî) sûd wergirin. Tarîxa istinsaxa nusxeya Jaba 1283 (1866-1867) û tarîxa telîfa berhemê jî 1273 (1856-1857) ye. Bêguman rûbirûkirina van her du tarîxan dê encamên girîng derxe meydanê. Ya herî girîng ew e ku zanîna tarîxa te'lîfa berhemê di tesbîtkirina nusxeyên eslî û yên kopî de roleke aşkera dilîze. Dema em li her du tarîxan (1273 û 1283) dinêrin, em dibînin ku tarîxa te'lîfê 10 salan berî tarîxa istinsaxê ye. Li gor vê nusxeya Riyazê Eşqa Aşiq Sipkî ya ku di koleksiyona A. Jaba de cih digire 10 salan piştî tarîxa te'lîfa berhemê hatiye istinsaxkirin. Ev jî nîşan dide ku ev nusxe ne nusxeya muellif e, nusxeyeke kopî ye û ji aliyê mustensixekî ve hatiye istinsaxkirin. Agahiyên ku Jaba jî dide vê yekê piştrast dikin. Lewra Jaba dibêje ku ev nusxe li ber nusxeya orjînal hatiye zêdekirin (Jaba, Kurd 53, wr. 6b). Lêbelê ji ber ku di qeyda istinsaxê de navê mustensix nehatiye dayîn, em nizanin berhem ji aliyê kê ve hatiye istinsaxkirin.

Madem ev nusxe nusxeyeke kopî ye, bi awayekî mentiqî ihtîmal heye ku nusxeya muellif, yan jî hin nusxeyên di yên istinsaxkirî jî gihîştîbin roja me. Çawa ku berî niha jî derbas bû, Bi rastî jî em dibînin ku nusxeyeke di ya vê berhemê li Tehranê tê parastin ku li jorê behsa wê hatibû kirin. Di qeyda istinsaxê ya vê nusxeyê de tarîxa istinsaxê wek 1273 (1856-1857) hatiye dayîn (Sipkî, 1273, wr.) ku ev tarîx di heman demê de tarîxa telîfa berhemê ye jî. Bi gotineke vekirî, sala telîfkirina berhemê û sala istinsaxa vê nusxeyê yek e. Ev jî nîşan dide ku bi ihtîmaleke mezin nusxeya Tehranê nusxeya muellif e. Eger em nusxeya Tehranê wek nusxeya muellif qebûl bikin, pêwîst e em wê ji bo nusxeya Jaba wek nusxeya binema qebûl bikin. Lewra Jaba bixwe gotiye ku ev nusxe li ber nusxeya muellif hatiye istinsaxkirin û ji aliyê nivîskarê berhemê ve hatiye kontrolkirin.

Bêguman ji bo gihîştina encamekê di vê biwarê de berawirdkirina nusxeya Tehranê û nusxeya koleksiyona A. Jaba dê roleke mezin bilîze. Li gor krîterên zanista destnivîsariyê, eger piştî berawirdkirinê di navbera her du nusxeyan de wekheviyeke tam hebe, bi taybetî eger ev wekhevî di şaşîyan de jî bê dîtin, ji wan nusxeyan a zû ji ya dereng re dibe binema, ya dereng jî dibe kopyaya wê (Esîlan1994; el-Munecid 1976; Togan1985, r. 86-88). Loma ji bo ku em jî

bigihîjin encamekê divê em van her du nusxeyan berawird bikin. Ji ber ku Mustafa Öztürk metnê rexneyî yên van her du nusxeyan amade kiriye, em ê jî di berawirdkirina her du nusxeyan de xwe bispêrin vî metnê rexneyî ku ji aliyê Öztürk ve hatiye amadekirin. Li gor tesbîten Öztürk (r. 29-31) di navbera metnên her du nusxeyan de ferqeke mezin tune ye û ev yek ji hindikayiya cudahiyên her du nusxeyan ên ku ji aliyê wî ve di aparatên de hatine nîşanan jî tê fêmkirin. Zêdebarî vê her du nusxe di hin şaşiyên de jî hevbeş in. Bo nimûne di her du nusxeyan de peyva “gündüz” bi şeweyeke şaş wek “günüz” û terkîba “pîş-i Mîre” jî bi şeweyeke şaş wek “pîş û Mîre” hatine nivîsîn. Ji bilî van tesbîtan Öztürk behsa hin sererastkirinên ku piştê li nusxeya Tehranê hatine zêdekirin kiriye ku ev sererastkirin di nusxeya Jaba de tune ye û ji bo vê jî du mînak dane. Ya yekem ev malika jêrîn e ku di nusxeya Tehranê de li ser peyva “edem” xêz hatiye kişandin û wek “edemden” ji nû ve hatiye nivîsîn.

Ketm-i **edem** oldı cümle peyda

İbda' kılan ana heyûla

Wate:

Her tişt ji korbûna tunebûnê derketin û peyda bûn.

Xweda ji wan re heyûlayek afirand.

Mînaka duyem jî malika jêrîn e ku di navbera di nusxeya Tehranê de “fakiri barî” bi şeweya “fakir ü barî” hatiye sererastkirin:

Nakd u zer ü sîm idüp nisarı

Şad eyliyegör **fakiri barî**

Wate:

Pere, zêr û zîv belav bike

Bila Xweda feqîr şad bike.


Öztürk, di gihîştina encamê de ev tesbîta dawî esas girtiye û ji ber nebûna sererastkirinên navborî di nusxeya Jaba de, gihîştîye wê encamê ku nusxeya Jaba ne li ber nusxeya Tehranê hatiye istinsaxkirin.

Eger em daneyên ku Öztürk dide binirxînin, ji ber girîngiya wê em dê pêşî li sererastkirinên ku di nusxeya Tehranê de cih digirin û di nusxeyan Jaba de cih nagirin binêrin. Berî her tiştî ne dema nivîsîna sererastkirinên nusxeya Tehranê diyar e, ne jî delîleke teqez di dest de heye ku ew sererastkirin ji aliyê muellif ve hatine kirin. Ji aliyê dî ve divê bê gotin ku her du sererastkirinên ku wek mînak hatine dayîn, ne ji bo teshîha metnê berhemê hatine nivîsîn. Lewra eger em wisa qebûl bikin, yanî eger em wan sererastkirinan wek metnê dirust qebûl bikin, ji aliyê şewaz û teknîka helbestê ve di beytan de şaşî derdikevin holê ku ne pêkan e nivîskar Aşiq Sîpkî şaşiyên wisa bike. Di malika yekem de eger em peyva

“edem” wek “edemden” bixwînin, şaşıyêke aşkera ya kêşa erûzê derdikeve holê û ahenga ku di tevahiya metnê berhemê de heyî di vê beytê de têk diçe. Ne pêkan e nivîskarê ku tevahiya berhema xwe bi awayekî serkeftî bi weznê “mef’ûlu mefa’ilun fe’ûlun” nivîsiye, bi awayekî ku weznê têk bibe forma dirust xêz bike û şûna wê formeke şaş binivîse.

Heçî sererastkirina duyem e, ew jî ji aliyê wateyê ve şaş e. Lewra nivîskar di “Şad eyliyegör fakiri barî” de behsa şadbûna kesên feqîr dike. Loma bikaranîna Waw/و di navbera “fakir” û “barî” de dê şaşıyêke wateyî derxe holê. Lewra di vê rewşê de behsa şadbûna feqîran û kesên dî bi hev re derdikeve holê ku mebesta nivîskar ne ev e. Di encamê de tê fêmkirin ku ne pêkan e ev sererastkirinên ku encamên şaş didin ji aliyê muellif ve hatibin kirin. Aşkera ye ku ev sererastkirin, çî bi mebesta sererastkirinê be, çî bi mebesta îzah û şîrovevê be ferq nake, ji aliyê kesekî dî ve hatine kirin. Ji ber vê jî nebûna van sererastkirinan di nusxeya Jaba de nabe asteng ku nusxeya Jaba li ber ya Tehranê hatibe istinsaxkirin. Tiştêkî asayî ye ku nusxeya Jaba berî nivîsîna wan sererastkirinan li ber ya Tehranê hatibe zêdekirin, yan jî ew sererastkirin ji ber ku encamên şaş didin di istinsaxê de li ber çavan nehatibin girtin.

Wek xulase em dikarin bibêjin ku nusxeya Tehranê nusxeya muellif e. Li gor agahiyên Jaba nusxeya Jaba li ber ya muellif hatiye istinsaxkirin. Wê demê nusxeya Jaba li ber ya Tehranê hatiye istinsaxkirin. Jixwe bi awayekî yekpareyî metnên nusxeya Jaba û nusxeya Tehranê wek hev in û zêdebarî ve şaşıyên wan jî wek hev in. Bêguman ev tev daneyên girîng in ku hebûna pêwendiyêke bihêz di navbera nusxeya Jaba nusxeya Tehranê de nîşan didin û ji ber ku ya Tehranê kevintir ew dibe nusxeya eslî û ya Jaba jî dibe kopyaya wê. Yanî bi awayekî aşkera derdikeve holê ku nusxeya Jaba li ber nusxeya Tehranê hatiye istinsaxkirin ku ev yek li jêrê jî hatiye şematîzekirin:



Şema: Şecereya her du nusxeyên Riyazê Eşqê

Ji aliyekî dî ve em dibînin ku sala istinsaxa nusxeya koleksiyona A. Jaba û sala birina wê bo Rûsyayê yek e. Lewra nusxe di sala 1283 (1866-1867)ê de hatiye istinsaxkirin û Jaba jî di navbera salên 1856-1867an de xebitiye. Ev jî nîşan dide ku nusxe di sala dawî ya Jaba de hatiye istinsaxkirin ku Jaba bixwe jî ev yek îfade kiriye (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-43b). Dîsa aşkera ye ku Jaba ev nusxe her wê salê şandiye Rûsyayê. Dîsa çawa Jaba jî îfade kiriye (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-43b) muellifê berhemê ‘Aşiq Sipkî di sala (1283/1866-1867) de li Erzirûmê bûye û ev nusxe li ser israra Jaba li Erzirûmê li ber nusxeya muellif hatiye istinsaxkirin û muellif jî ev nusxe kontrol kiriye. Çawa ku Jaba jî gotiye Wisa tê fêmkirin ku di çarçoveya berhevkarîya koleksiyona A. Jaba de bi mebesta ku nusxeyekê ji

berhema Aşiq Sipkî bibin Rûsyayê, li ber nusxeya wî ya orjînal nusxeyeke nû hatiye istinsaxkirin ku ew jî nusxeya Jaba ye. Bi gotineke dî ji ber ku nexwestine nusxeya muellif bibin Rûsyayê, li ber wê nusxeyeke nû hatiye istinsaxkirin û ji bo ku nusxeya ku dê biçe Rûsyayê tekûz be ji aliyê nivîskar ve hatiye kontrolkirin. Lêbelê çawa em dê li jêrê li ser rawestin ev nusxe ji aliyê huner, estetîk û teknîkên destnivîsariyê ve lawaz e û ev jî nîşan dide ku ji bo ku istinsax zû xilas bibe hinekî lez hatiye kirin. Her çî be ev nusxe li ber nusxeya muellif hatiye zêdekirin û loma jî ji aliyê dêrîniyê nusxeyeke girîng e ku piştî nusxeya muellif tenê bi 10 salan hatiye istinsaxkirin û di rêza duyem de tê.

Gelo nusxeya muellif çawa gihaye Tehranê? Li gor agahiyên ku Mustefa Dehqan di vê biwarê de dide nusxeya muellif berê di destê malbateke Îranî ya tacir bi navê Sultan el-Quraî de bûye û di sala 1969ê de ji vê malbatê Ca'fer Sultan el-Quraî ev nusxe teslîmî Kutubxaneya Meclisa Şûraya Millî kiriye. Pêwendiyên vê malbatê yê tîcarî li devera rojhilatê Tirkîyeyê, yan jî li Ermenistan û Azerbeycanê bi malbateke tirk a tacir re hebûye. Bi ihtîmaleke mezin vê malbatê ev nusxe ji cihekî wek Kurdistana Tirkîyeyê, yan jî Ermenistana Rojava kirîne (Dehqan 2017, r. 55). Li vir tiştê girîng ew e ku Dehqan bêtî ku muellif û devera wî bizane ev agahî dane.

Di nav vê peywendê de em dixwazin pirsgirêka navê mustensix jî bînin rojevê. Çawa li jorê jî hatibû gotin di qeyda istinsaxê de navê mustensix nehatibû dayîn. Li gor ku muellif Aşiq Osman Sipkî nusxeya Jaba kontrol kiriye ew bixwe ne mustensix e. Wê demê mustensix xebatkarekî koleksiyona A. Jaba ye. Gelo dibe ku ev kes Bazîdî be? Dema em lê dinêrin em dibînin ku ev nusxe naşibe berhemên dî yê ku di koleksiyona A. Jaba de ji aliyê Bazîdî hatine istinsaxkirin. Bi rastî jî Mewlûda Bateyî (Kurd 9), Nûbihara Biçûkan (Kurd 22), Leyla û Mecnûn (Kurd 31) û Adat û Rusûmatname (Kurd 34) ku Bazîdî istinsax kirine, hem di zehriyeyan de, hem di qeydên istinsaxê de bi şêwazeke hevpar hatine amadekirin. Lêbelê di vê bê gotin ku Bazîdî ev hemû di sala 1274 [1858-59]ê de istinsax kirine. Heçî nusxeya Mem û Zîna Aşiq Sipkî ye ew di sala (1283/1866-1867)ê hatiye istinsaxkirin. Eger em di nav 9 salan de guherîna kalîgrafiya Bazîdî wek tiştêkî asayî bibînin, wê demê Bazîdî wek mustensixê vê nusxeyê jî dikare bê hizirkirin.

Eger em hinekî jî ji aliyê huner, estetîk û teknîkên destnivîsariyê ve li nusxeyê binêrin, em dê bibînin ku nusxe ji van aliyên ve gelekî lawaz e. Lewra di zehriyeyê de, yan jî di rûpelên pêşî û dawiyê de tezhîb qet tune. Di vê çarçoveyê de di rûpelê pêşî de serlewhe jî tune. Di cedwelê de tu estetîk li ber çavan nehatiye girtin. Cedwel heta bi 24b'yê yekxêzî, ji 25a'yê şûnde duxêzî ye. Hin xêz derketine derve, hin xêz jî xwehr in. Di sê-çar rûpelan de beytên dawî li ser cedwela jêrîn hatine nivîsîn. Rûpelekî bi cedwel wek zehriye hatiye bikaranîn ku diviyabû zehriye bê cedwel bûya. Dîsa di binê wereqên b'yê de peyva te'qîbê nehatiye bikaranîn. Kêmasiyeke dî jî ew e ku wereq 1b vala hatiye hiştin.

Di sîstema jimarebendiyê de jî gelek qelsî hene. Berî her tiştî jimarebendiyê nusxeyê ne li gor sîstema wereqên destnivîsan hatiye sazkirin. Li jora wereqan bi murekkeba reş li gor sîstema kitêbên çapkirî bo her rûpelî jimare hatine danîn. Herweha zehriye nehatiye jimarekirin. Dîsa jimareya 1ê du caran hatiye danîn: Hem li ser wereq 2a'yê, hem jî li ser wereq 2b'yê. Ya xirab ew e ku jimarebendî li ser bingeha vê şaşiyê hatiye domandin û berhem bi jimareya 114an qediyaye.

Lêbelê pêwîst bû bi jimareya 117an qediyaba. Kêmasiyeke dî jî ew e ku cihekî sabit ji bo jimarekirinê tuneye. Carinan li milê rastê, carinan li milê çepê, carinan jî li her du milan (wr.26a) jimare hatine nivîsîn. Ev şaşiyên di jimarebendiyê de piştî ji aliyekî pisporekî/pisporekê ve hatine sererastkirin û li jêra wereqan bi qelemzîreçê bi awayekî dirust li gor sîstema wereqê jimare hatine danîn ku çawa di beşa nusxeya Akifê Wanî de jî me got ev pispor ji kurdologên Rûsan kesekî wek Jaba û Rudenko ye. Jimareya 1ê li gor standardê li ser zehriyeyê hatiye danîn û nusxe bi awayekî durist heta bi 59ê hatiye jimarekirin. Nusxe bi 59a'yê diqede û 59 b vala ye.

Nusxeya Jaba ji aliyê fêmbariyê û hebûna teshîhan ve jî nusxeyeke binirx e. Lewra bi îmlayeke xweş û fêambar hatiye nivîsîn. Di hamişan de qeydên wek muqabele, sema', îcazet, û qiraetê ku di fêmbariyê de rol dilîzin tunene. Lêbelê li ser nusxeyê gelek teshîh hatine kirin. Di vê çarçoveyê de bi heman rêbazê hin peyv hatine jêbirin û şûna wan peyvîne nû hatine nivîsîn. Di van cihan tevan de dewsa peyva jêbirî maye û peyvên ku nû hatine nivîsîn jî bi qelemeke cuda hatine nivîsîn. Peyvên ku di çarçoveya teshîhê de ji nû ve hatine nivîsîn ev in: ricet, içre (14a), ciwanî (15b), 'elîm (19b) nazenîni (21a), herîsin, xesîsin (22b), 'izzet (26a) sefa, hep (28b), ger (33a), hemra, senden (58b), edeb, zulfîqar telaşe (29a), nigarim (39b). Herweha hin peyv jî hatine zêdekirin. Bo nimûne di 19b'yê de "qildi" û di 33a'yê de "zerre" piştî hatine zêdekirin (ol zerre sifet Zîn-i mehzûn). Çawa ku li jorê hat gotin ev nusxe ji aliyê Aşiq Osman Sipkî ve hatibû kontrolkirin. Loma em bi hêsani dikarin bibêjin ku kesê ku ev teshîh kirine Aşiq Osman Sipkî ye. Bêguman nusxeyeke ku ji aliyê muellifê berhemê ve kontrola wê hatibe kirin, xwedî nirxekî taybet e.

4. ENCAM

Wek diyardeyeke ku di encama pêwendiyên edebiyata kurdî û tirkî de derketiye meydanê di serdema Osmaniyan de nivîsîna Mem û Zînê bi zimanê tirkî bûye wek kevneşopiyekê û vê kêliyê bi qasî ku tê zanîn ji aliyê pênc kesayetên kurd ve bi zimanê tirkî Mem û Zîn hatine nivîsîn. Kesên ku di vê serdemê de Mem û Zîna Xanî veguhastine tirkîya Osmanî ev in: Ehmed Faiq, 'Ebdul'ezîz Xalis, Zulfîqar Fethî, Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî (Nezmî). Di koleksiyona A. Jaba de jî yek a Akifê Wanî û yek jî ya Aşiq Osman Sipkî du nusxeyên Mem û Zînê bi tirkî cih digirin.. Di vê gotara ku li ser van her du nusxeyan û muellifên wan hatiye amadekirin de çendînc encam hatin bidestxistin.

Di koleksiyona A. Jaba de hebûna du nusxeyên Mem û Zînê bi tirkî ku ji aliyê du muellifên cuda ve hatine nivîsîn ji aliyê parastin û veguhastina wan bo roja me tiştêkî girîng e. Vê kêliyê tekane nusxeya Mem û Zîna tirkî ya Akifê Wanî û yek ji du nusxeyên Mem û Zîna Aşiq Osman Sipkî di vê koleksiyonê de ne. Her du nusxe ji aliyê dêrîniyê ve nusxeyên baş in. Lewra li ber orjînalên wan bo Jaba hatine zêdekirin û piştî nusxeya muellif di rêza duyem de ne.

Nivîskarên van Mem û Zînan Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî du kesayet in ku heta îro tam nehatine naskirin. Akifê Wanî pêşî li Wanê miftîti kiriye, piştî jî heta bi mirina xwe di mulkiyeya Osmaniyan de wek qeymeqam (Maraş, Mûş, Bazîd) û muteserif (Batum) xebitiye û di sala 1863yan de li Batumê koçî dawiyê kiriye. Akifê Wanî di sala 1856an de dema li Bazîdê qeymeqam bûye Mem û Zîna

xwe nivîsiye, lêbelê ji ber ku ji Bazîdî veqetiyaye berhema xwe ya ku heta bi beşa 21ê nivîsiye nivco hiştiye û tamam nekiriye. Dema di sala 1857an de hatiye Erzîrûmê Jaba ji bo xwe nusxeyek daye istinsaxkirin. Nusxeya ku niha di koleksiyona A. Jaba de cih digire ev e. Nusxeya Wanî herçiqas nusxeyeke nivco ye jî, ji ber ku ji daneyên dîtir dem û cihê istinsaxa wê tên zanîn û di çarçoveya zanyariyên berdest de tekane nusxeya Mem û Zîna Akifê Wanî ye xwedî girîngiyeke mezin e.

Muellifê Mem û Zîna duyem Aşiq Soman Sipkî ji eşîra Sipkan gundê Uznî ye ku nêzî Erzîrûmê ye û hevalê Akifê Wanî ye. Peyvên “faiq” ku di berhema wî de derbas dibin ne mexles in û pêwendiyekê di navbera wî û Ehmed Faiq de saz nakin. Ev kesayetekî cuda ye û mexlesa wî jî Nezmî ye. Li Erzîrûmê wek dengbêjê waliyê Erzîrûmê Çapanoğlu xebitiye û halê wî gelekî xweş bûye. Lêbelê peyra rewşa wî xirab bûye veqetiyaye gundê xwe. Li ser mirina Akifê Wanî ku Mem û Zîna wî nivco mabû, Mem û Zîn bi tevahî tercumeyî tirkî kiriye. Di sala 1867an de li Erzîrûmê destûr daye Jaba ku nusxeyekê ji Mem û Zîna wî kopî bike. Nusxeya muellif bixwe ji aliyê malbateke tacir a Îranî ve (malbata Sultan el-Quraî) ve hatiye bidestxistin û niha li Tehranê tê parastin.

Her du nusxe jî şûna ku wek “Mem û Zîn” bîna binavkirin bi navekî taybet hatine binavkirin. Herçiqas ji aliyê hin lêkolîneran ve kalîgrafiya vî navî bi şaşî wek “Reyhînê Eşq” hatibe xwendin jî, taybetiyên kalîgrafîk nîşan didin ku ev şêweya xwendinê şaş e û ya rast divê “Riyazê Eşq” be. Pêşî Akifê Wanî ev nav li berhema xwe kiriye. Piştî xebatkarên koleksiyona A. Jaba ev navê berhema Akifê Wanî li ser nusxeya Jaba ya Mem û Zîna Aşiq Osman Sipkî jî nivîsîne. Lêbelê divê bê zanîn ku ev nav di nusxeya muellif a Mem û Zîna Sipkî de nehatiye bikaranîn. Yanî bikaranîna vî navî di nusxeya Aşiq Osman Sipkî de taserufeke xebatkarên koleksiyona A. Jaba ye.

Her du nusxe jî ji aliyê fêmbariyê ve baş in, lêbelê ji lawazbûna hunerên destnivîsan û kêmasiya hin taybetiyên standart ên destnivîsan tê fêmkirin ku bi lez û bez hatine istinsaxkirin. Xuyaye dema her du muellif hatine Erzîrûmê û A. Jaba daxwaza kopyayekê ji wan kiriye di demeke berteng de hatine istinsaxkirin. Hin kêmasiyên ku di her duyan de hevbeş ev in: Jimarebendî ne li gor sîstema standart a destnivîsan e, wereq 1b vala ne, cedwel ne tam in, di zehriyeyê de bêyî neqş û tezhîbê tenê navê berhemê û navê muellif hatiye nivîsîn, di rûpelên ewil de serlewhe tune ye û hwd.

JÊDER

Jêderên Çapkirî:

Adak, A. (2015). “Li Gorî Serdemên Tarîxî Têkiliyên di Navbera Edebiyatên Kurdî û Tirkî yê Klasîk de”, *Sempozyûma Edebiyata Berawirdî -Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî*, (amd. Nüket Esen & Ramazan Çeçen), Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Adak, A. (2012). “Di Serdema Osmaniyana de li Pey Rêça Ehmedê Xanê Sê Mem û Zînê bi Tirkî”, *Nûbihar*, j.120, r. 16-23.

Bergsträsser, G. (2011). *Metin Tenkidi ve Yazma Metinleri Yayınlama İlkeleri*, amd. Muhammed Hamdi el-Bekri, Çev. Eyyüp Tanrıverdi, İstanbul: Kitabevi.

Binbîn, E û Şewqî T (2005). *Mu'cem Mustelehat el-Mextût el-'Erebî Qamûs Kodîkolocî*, Merakeş: el-Xizane el-Heseniyye er-Ribat.

Dehqan, M. (2017). “A Late Ottoman Turkish Verse Version of Xani’s Mem û Zîn in the Manuscript Collection of Teh Islamic Consultative Assembly Library”, *Manuscripta Orientalia*, Vol.13 No 2 June 2007.

Esîlan, E. E. (1994). *Tehqîqu'l-Mextûtat beyne'l-Waqi' we'n-Nehc el-Emsel*, Riyad: Mektebet el-Melik Fehd el-Weteniyye.

Faik, A. (1969). *Mem o Zin*, amd. Sırrı Dadaşbilge, İstanbul: Matbaa Teknisyenleri Basımevi.

Karataş, Y. (2014). *Bayezid Sancağı ve İdarecileri (1700-1914)*, İstanbul: Kitabevi.

Levend, A. S. (2008). *Türk Edebiyatı Tarihi*, İstanbul: Türk Tarih Kurumu Yay.

el-Munecid, S. (1987). *Qewa'id Tehqîq el-Mextûtat*, Dar el-Kitab el-Cedîd, Beyrûd: Dar el-Kitab el-Cedîd.

Nazmi (2017). *Reyahin-i Aşk*, (amd. Mustafa Öztürk), Diyarbakır: Weşanên Lîs.

Öztürk (2017). “Eser ve Nüsha ile İlgili Bilgiler”, *Nazmi Reyahin-i Aşk*, Diyarbakır: Weşanên Lîs.

Tek, A. (2018). *Hamisiz Şair Babasız Metin Mem û Zîn ve Osmanlıca Çeviriler Üzerine Bir İnceleme*, İstanbul: Nûbihar.

Toska, Z. (2015). “Klasik Edebiyat Bağlamında Mem û Zîn Mesnevisi”, *Sempozîyûma Edebiyata Berawirdî -Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî*, (amd. Nûket Esen & Ramazan Çeçen), Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Togan, A. Z. V. (1985). *Tarihte Usul*, İstanbul: Enderun Kitabevi.

Jêderên Destnivîs:

Jaba, A. (?) *Catalogue de Manuscripts Kurdes*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsya, j. Kurd 53.


Jaba, A. (?) [*Têbîniyên Jaba*], nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsya, j. Kurd 54.

Sipkî, ‘A. (sala istinsaxê: 1283). *Riyazê Eşq*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsya, j. Kurd 38.


Sipkî, ‘A. (sala istinsaxê: 1273). *Memî û Zîn*, Kutubxaneyê Meclisê Şûraya Millî ya Tehranê, j. 9385.

Wanî ‘A. (?) *Riyazê Eşq*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsya, j. Kurd 39.


Kurd 39 (Akifê Wanî)



Zehriye (wr. 1a)




Rûpela Pêşiyê (wr. 2a)




Rûpela Dawiyê (wr.36a)


Kurd 38 (Aşiq Osman Sipkî)



Zehriye (wr. 1a)



Rûpela Pêşiyê (wr. 2a)



Rûpela Dawiyê (wr. 59a)

‘AKİFÊ WANÎ & ‘AŞIQ OSMAN SİPKÎ Û MEM Û ZÎNÊN WAN ÊN BI TIRKÎ DI KOLEKSİYONA A. JABA DE

Abdurrahman ADAK*

PUXTE

Di koleksiyona A. Jaba de li ser bingeha Mem û Zîna Xanî du Mem û Zînên bi tirkî ku ji aliyê du nivîskarên cuda ve hatine nivîsîn hene. Ew jî berhemên Akifê Wanî (Kurd 39) û Aşiq Osman Sipkî (Kurd 38) ne. Her du muellifan jiyana xwe di sedsala XIXem de bûrandine. Wanî, xelkê Wanê ye û burokratekî girîng ê serdema xwe ye. Sipkî jî ji eşîra Sipkan e û ji gundekî nêzî Erzîrûmê ye. Wanî, berhema xwe di 1856an de nivîsiye, lêbelê nekariye xilas bike. Nuxxeya Jaba tekane nuxxeya vê berhemê ye. Heçî Sipkî ye, wî jî berhema xwe di 1273 (1856-1857)an de nivîsiye. Du nuxxeyên vê berhemê hene: Nuxxeya Tehranê û ya Jaba. Ji ber ku di nuxxeya Tehranê de tarîxa nivîsîna berhemê û tarîxa istinsaxa wê yek e, bi ihtîmaleke mezin ev nuxxe ya muellif e. Daneyên berdest nîşan didin ku nuxxeya Jaba di sala 1283 (1866-1867)an de li ber nuxxeya muellif hatiye istinsaxkirin. Her du nuxxeyên koleksiyona A. Jaba dema muellifên wan hatine Erzîrûmê li ser daxwaza Jaba hatine istinsaxkirin. Wisa xuya ye ku istinsax bi lez û bez hatiye kirin. Lewra di nuxxeyan de huner û teknîkên berhemên destnivîs li ber çavan nehatine girtin. Taybetiyeke her du nuxxeyan ew e ku şûna Mem û Zînê bi navê “Riyazê Eşq”ê (bi xwendineke şaş Reyahîne Eşq) hatine binavkirin. Her çî be veguhestina van nuxxeyan bi rêya koleksiyona A. Jaba bo roja me gelekî girîng e. Di gotarê de em ê bîyografîya Wanî û Sipkî di çarçoveya zanyariyên nû de ron bikin, li ser her du destnivîsan analîzeke kodîkolojîk bikin û di hin xalên binîqaş de hizrên xwe îfade bikin.

Bêjeyên Sereke: Koleksiyona A. Jaba, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Aşiq Osman Sipkî, Akifê Wanî, Mem û Zînên bi tirkî, kodîkolojî.

AKIF-İ VANÎ & ‘AŞIK OSMAN SİPKÎ VE A. JABA KOLEKSİYONUNDAKİ TÜRKÇE MEM Û ZİNLERİ

ÖZ

A. Jaba koleksiyonunda Ehmedê Xanî'nin kaleme aldığı *Mem û Zin* esas alınarak yazılan farklı yazarlara ait iki tane Türkçe Mem û Zin nüshası bulunmaktadır. Bunlar Akif-i Vanî (Kurd 39) ve Aşık Osman Sipkî (Kurd 38)'nin eserleridir. Her iki müellif yaşamlarını XIX. yüzyılda geçirmiştir. Birincisi, Vanlı olup dönemin önemli bir bükratıdır. İkincisi ise Sipkan aşiretine mensup olup Erzurum'a yakın bir köydenidir. Akif-i Vanî eserini 1856 yılında yazmış ancak tamamlayamamıştır.

Makale Gönderim Tarihi: 01.07.2017, Kabul Tarihi: 31.07.2018
Doi: 10.26791/sarkiat.449874

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî.
abdurrahmanadak@gmail.com, Orcid ID: 0000-0002-9124-1605

Jaba nüshası eserin bilinen tek nüshasıdır. Aşiq Sipkî ise eserini 1273 (1856-1857) yılında kaleme almıştır. Sipkî'nin eserinin iki nüshası bilinmektedir: Tahran nüshası ve Jaba nüshası. Tahran nüshasında istinsah tarihi ile eserin telif tarihi uyuştugu için büyük ihtimalle bu nüsha müellif nüshasıdır. Eldeki verilere göre Jaba nüshası 1283 tarihinde müellif nüshasından istinsah edilmiştir. Jaba koleksiyonunda yer alan her iki nüsha da müellifleri Erzurum'a geldiklerinde Jaba'nın isteği üzerine Erzurum'da istinsah edilmişlerdir. Ancak istinsah işleminin aceleye geldiği anlaşılmaktadır. Zira nüshalarda kitap sanatları ve tekniklerine fazla riayet edilmemiştir. Nüshaların bir diğer özelliği de "Mem û Zîn" ismi yerine "Riyaz-ı Aşk" (yanlış okuma ile "Reyahîn-i Aşk") ismiyle isimlendirilmiş olmalarıdır. Her ne olursa olsun bu nüshaların Jaba Koleksiyonu yoluyla günümüze ulaşmış olmaları çok önemlidir. Makalede Vanî ve Sipkî'nin biyografilerini yeni bilgiler ışığında gün yüzüne çıkartacak, her iki yazma üzerinde kodikolojik bir analiz yapacak ve konu ile ilgili tartışmalı bazı hususlarda görüşlerimizi ifade edeceğiz.

Anahtar Kelimeler: A. Jaba koleksiyonu, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Aşiq Osman Sipki, Akif-i Vani, Türkçe Mem û Zîn, kodikoloji.

AKIF-I VANÎ & 'AŞIK OSMAN SİPKÎ AND THEIR TURKISH MEM Ü ZÎNS IN A. JABA COLLECTION

ABSTRACT

In the Jaba collection, there exist two copies of Turkish Mem u Zîn, written by different authors, based upon the Kurdish Mem û Zin of Ehmedê Xanî. They are works of Akifê Wanî (Kurd 39) and Aşiq Osman Sipki (Kurd 38). Both authors lived in XIX. century. The former is from Van and a significant diplomat of his time. The latter is a member of Sipkan tribe and from a village near Erzurum. Akifê Wanî wrote down in 1856 but could not finish it. The copy of Jaba collection is the sole known copy. As for Aşiq Sipki, he wrote down his work in 1273 (1856-1857). Two copies of Sipki's work are known: Tahran copy and Jaba copy. As inscript date and writing date are coincided, most likely this is the auther's own copy. According to available data, the Jaba copy was inscripted form auther's copy in 1283. Both copies of the Jaba collection were inscripted in Erzurum at the request of Jaba when their authors came in Erzurum. However it seems that the inscription was dane hastely. Because writing arts and techniques were not followed properly. Another significance of the copies is that instead of Mem û Zîn title, they are named by "Riyaz-ı Aşk" (by misreading "Reyahîn-i Aşk"). In any way it is important that these copies have reached today via Jaba collection. In the article will reveal the biographies of Wanî and Sipkî in the light of new information, conduct a codicological analysis on both scripts and express our opinion on some controversial issues.

Keywords: A. Jaba collection, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Aşiq Osman Sipki, Akifê Wani, Turkish Mem u Zîn, codicology.

DESTPÊK

Di koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên kurdî de du Mem û Zînên bi tirkî hene ku yek ji wan a ‘Akifê Wanî û ya dî jî ya ‘Aşiq Osman Sipkî ye. Mem û Zîna Akifê Wanî di jimareya Kurd 39 û ya ‘Aşiq Osman Sipkî di jimareya Kurd 38’ê de cih digirin. Ev her du berhem herçiqas bi zimanê tirkî hatine nivîsîn jî, ji gelek aliyên ve bi kurdolojiyê ve jî têkildar in. Berî her tiştî her du berhem di koleksiyoneke destnivîsên kurdî de cih digirin ku di qeydên wan ên arşîvê de jî navê “kurd” hatiye bikaranîn. Ji aliyekî dî ve muellifên wan (‘Aşiq Osman Sipkî û ‘Akifê Wanî) du kesayetên kurd ên tarîxî ne bi awayekî siruştî pêdivî bi nasandina wan heye. Dîsa ev her du berhem, wek du berhemên ku mijarên xwe ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî wergirtine, rengvedana edebiyata kurdî di edebiyata tirkî de temsîl dikin û ji vî aliyê ve di berawirdkirina edebiyatên kurdî û tirkî de wek mijareke girîng derdikevin pêş. Bêguman ev tev jî girîngiya mijarê bi awayekî aşkera diselmînin. Lêbelê divê em bibêjin ku berawirdkirina van Mem û Zînan û Mem û Zîna Xanî ne armanca vê gotarê ye. Di gotarê de du armancên sereke hene. Armanca yekem ew e ku biyografiya her du muellifan bê ronkirin ku her du muellif jî heta niha bi agahiyên kêr û şaş hatine nasandin û pêdivî bi sererastkirina van şaşiyên heye. Armanca duyem jî ew e ku li ser Mem û Zînên wan ên tirkî ku di koleksiyona A. Jaba de cih digirin analîzeke kodîkolojîk bê kirin ku ev di heman demê de sînor û rêbaza gotarê jî îfade dibe. Çawa tê zanîn kodîkolojî tê wateya zanista destnivîsariyê ku ji hemû aliyên ve destnivîsan ji bo xwe dibe mijara lêkolînê (Ji bo kodîkolojiyê bnr. Binbîn&Şewqî, 2005). Em ê jî van her du nuxeyên destnivîs li gor rêbaza nasandina nuxeyên destnivîs bidin nasandin û li ser xalên wek navên muellif, mustensix û berhemê, cih û dema istinsaxê, sebebê istinsaxê, eslê nuxeyê, pêwendiya her du nuxeyan tesbît û analîzan bikin û di van biwaran de tiştên ne zelal ron bikin. Qeydên ku di van her du destnivîsan de cih digirin, taybetiyên destnivîsan ên fîzîkî, hunerî û kalîgrafîk, zanyariyên biyografîk ên her du muellifan û taybetiyên koleksiyona A. Jaba dê di tesbît û analîzên me de rêberiyê bikin.

Di gotarê de ji bilî destpêkê sê beşên bingehîn û beşên encam, jêder û pêvekan cih digirin. Di beşa yekem de bi mebesta ku ji mijara gotarê re bibe rêxweşker em dê bi kurtî û giştî li ser diyardeya “Mem û Zînên bi tirkîya Osmanî” rawestî û jimara Mem û Zînên bi tirkî û muellifên wan tesbît bikin. Di vê beşê de bi taybetî jî em dê li ser tesbîtîkirina muellifê Mem û Zîna Kurd 38ê rawestî ku mijara gotara me ye jî. Lewra nuxeya Kurd 38ê tûşî nisbetîkirina du muellifên cuda hatiye ku yek ji wan çawa ku qeydên koleksiyona A. Jaba jî diselmîne Aşiq Osman Sipkî ye û yê dî jî Ehmed Faiq e. Bi gotîneke vekirî li gor nêrînekê ‘Aşiq Osman Sipkî wek Ehmed Faiq hatiye qebûlîkirin. Loma pêwîst e em bizanin ka gelo ‘Aşiq Osman Sipkî û Ehmed Faiq bi rastî jî heman kes in, yan du kesayetên cuda ne? Di vê beşê de me hewl da ku em vê pirsê bibersivînin û bi vî awayî jimara kesayetên ku bi tirkî Mem û Zîn nivîsîne ron bikin. Ev yek di tesbîtîkirina biyografiya ‘Aşiq Osman Sipkî de jî dê bibe diyarker ku beşa duyem a gotarê ji bo vê mijarê hatiye terxankirin. Lewra zanyariyên biyografiya ‘Aşiq Osman Sipkî li

gor pêwendiya wî bi Ehmed Faiq re dê biguherin. Eger ew Ehmed Faiq be biyografiyeke cuda û eger ne Ehmed Faiq be biyografiyeke cudatir dê li pêşberî me be.

Di beşa duyem de em dê li ser biyografi û nasnameya tarîxî ya muellifê Kurd 39ê 'Akifê Wanî û yê Kurd 38ê 'Aşiq Osman Sipkî rawestin. Ji ber ku muellifên van her du Mem û Zînan heta niha di lîteratura kurdî de zêde cih negirtine û nehatine naskirin û agahiyên ku derheqê wan de hatine belavkirin jî kêr û şaş in, bi rastî jî pêdivî bi tesbîtkirin û belavkirina biyografi û nasnameya wan a tarîxî heye. Mixabin derheqê van her du kesayetên de di dest me de zêde çavkanî tunene, loma jî di tesbîtkirina biyografiya wan de herî zêde em dê xwe bispêrin têbînîyên ku di koleksiyona A. Jaba de cih digirin ku ev têbînî mijarê heta asteke bilind çareser dikin. Hêjayî gotinê ye ku berhemeke ku li ser rêvebirên sinceqa Bazîdê bi navê *Bayezid Sancağı ve İdarecileri* (Karataş, 2014) hatiye nivîsîn jî di ronkirina biyografiya Akifê Wanî de gelekî bi kêrî me hat.

Di beşa sêyem de ku beşa herî berfireh a gotarê ye, em dê ji aliyê kodîkolojiyê ve li ser her du nusxeyên destnivîsên her du Mem û Zînan bi tirkî rawestin, wan bidin nasandin û analîz û nirxandinekê li ser wan bikin. Di vê beşê de em dê ji bo navên her du Mem û Zînan Koleksiyona A. Jaba sernavekî taybet jî vekin. Lewra di her du nusxeyan de bi awayekî enteresan şûna ku navê "Mem û Zîn"ê li berheman bê kirin ku ya siruştî ev e, navekî cuda li wan hatiye kirin û ya balkêştir jî ev nav ji aliyê lêkolîneran ve bi du şêweyên cuda hatiye xwendin: "Reyhînê Eşq" û "Riyazê Eşq". Me jî mijar bi hûrgulî pêşkêş kir û di çarçoveya taybetiyên kalîgrafîk ên navan û wêneyên wan de hizra xwe îfade kir.

Piştî beşên encam û jêderan, di dawiya gotarê de di beşa pêvekan de ji destnivîsên her du berheman hin wêne hatin bicihkirin.

1. MEM Ê ZÎN DI TIRKIYA OSMANÎ DE

Çi werger be, çi adaptasyon yan jî nezîre be, nivîsîna Mem û Zînan bi tirkî, bi gotineke dî veguhestina Mem û Zîna Ehmedê Xanî bo zimanê tirkî, diyardeyeke tarîxî ya edebiyatên kurdî û tirkî ye ku di encama têkilîyên siyasî û civakî yê kurd û tirkan de derketiye meydanê. Pêwendî û danustandinên edebiyatên kurdî û tirkî bi piranî bi şêweya rengvedana edebiyata tirkî li ser ya kurdî, carinan jî bi şêweya rengvedana edebiyata kurdî li ser ya tirkî xwe nîşan daye ku ev yek xwe dispêre pozisyona biavantaj a zimanê tirkî û ya bêavantaj a zimanê kurdî. Her bi çi awayî be, em dibînin ku kurdî heta astekê rengê xwe daye edebiyata tirkî û guman tune ye ku Mem û Zînan tirkî ji bo vê yekê wek nimûneyên herî bihêz derdikevin pêş (Adak, 2015, r. 75-110).

Bi qasî ku em dibînin di qonaxên tarîxî de veguhestina Mem û Zînan bo zimanê tirkî li ser du serdeman dikare bê dabeşkirin: Serdema klasîk/Osmaniyan û serdema modern/Cumuhûriyetê. Ji aliyê şêweyê ve jî bi giştî dikare bê gotin ku Mem û Zînan tirkî di serdema klasîk de telif û di serdema modern de werger in. Herçiqas di serdema klasîk de hin Mem û Zînan wek tercume hatibin binavkirin jî, ji ber ku di peywenda wê serdemê de mebest ji tercumeyê ne wergera lîteral e, ew jî

wek telîf dikarin bèn qebûlîkirin ku di vê gotarê de jî her bi vî awayî serederî bo wan dê bê kirin. Çawa ku ji aliyê pisporan ve jî hatiye dupatîkirin, wergera serdema klasîk û wergera serdema modern ne heman tişt in û wergera serdema klasîk ne wergereke lîteral bi wateya îroyîn e, berevajiyê wê veguheştineke hunerî û azad e ku ji aliyê mutercim ve wek telîfeke nû tê hizirkirin (Ji bo agahiyên berfireh bnr. Levend, 2008, r. 80-88; Tek, 2018, r. 101-110). Di serdema klasîk de îlham ji *Mem û Zînê* hatiye wergirtin û li ser bingeha wê îlhamê di kirasê zimanekî cuda de û bi teserrûfên curbicur mijar ji nû ve hatiye hûnandin. Lêbelê di serdema modern de *Mem û Zîn* bi awayekî lîteral bo zimanê tirkî hatine veguhestin.

Di çarçoveya agahiyên berdest de di wê serdemê de pênc heb *Mem û Zîn* bi zimanê tirkî hatine nivîsîn. Ji van *Mem û Zînan* sê heb jê ji aliyê me ve hatibûn nasandin ku ew jî yên Ehmed Faiq, ‘Ebdul’ezîz Xalis û Zulfîqar Fethî ne (Adak, 2012, r. 16-23). Lêbelê piştî aşkera bû ku di serdema klasîk de du *Mem û Zînên* dî jî bi zimanê tirkî hatine nivîsîn. Yek ji wan a Aşiq Osman Sîpkî (Nezmî) ye (Öztürk 2017; Tek, 2018) û ya dî jî ya Akifê Wanî (Tek, 2018, r. 140-153) ye. Bi van *Mem û Zînan*, kojima *Mem û Zînên* tirkî yên serdema klasîk dibe pênc ku bi baweriya me ji bo nîşandana asta tesîra *Mem û Zînê* ev jimar bi tena serê xwe bes e.

Hebûna pênc *Mem û Zînên* tirkî, ji aliyê muellifan ve tê wê wateyê ku di serdema klasîk de kesên ku *Mem û Zîn* bi tirkî nivîsîne jî her pênc in. Lêbelê bi vê jimarê re têkildar pirsgirêkek heye ku tam li vê derê divê bê çareserkirin. Lewra li gor nêrînekê Aşiq Osman Sîpkî û Ehmed Faiq ne du kesayetên cuda ne, berevajiyê wê heman kesayet in. Li gor vê *Mem û Zîna* ku bo Aşiq Osman Sîpkî tê nisbetîkirin jî ya Ehmed Faiq e û bi vî awayî Ehmed Faiq du *Mem û Zîn* nivîsîne ku yek werger û yek jî nezîre ye (Tek 2017, r. 138). Ji bo girîngiya wê em dixwazin li vê derê mijarê vekin û qeneeta xwe îfade bikin. Bêguman jiyana Aşiq Osman Sîpkî ku di beşa duyem a gotarê de dê cih bigire, li gor qeneeta ku em dê bigihinê dê bê nivîsîn. Bi gotineke dî ji bo ku nasnameya Aşiq Osman Sîpkî derkeve holê, berî her tiştî divê pêwendîya wî û Ehmed Faiq bê ronîkirin ku ev yek ji bo mijara me xaleke heyatî ye.

Dema em li mijarê dinêrin, em dibînin ku nêrînen ku di vê biwarê de hatine îfadekirin dudu ne: Li gor nêrîna yekem Aşiq Osman Sîpkî û Ehmed Faiq du kesayetên cuda ne, her yek ji wan xwediyê *Mem û Zîneke* bi tirkî ye û yê yekem mexlesa Nezmî û yê duyem jî mexlesa Faiq bi kar aniye (Toska 2015, r. 113; Öztürk 2017, r. 23). Li gor nêrîna duyem jî Aşiq Osman Sîpkî û Ehmed Faiq heman kesayet in û vî kesî du *Mem û Zînên* bi tirkî nivîsîne. Ji van *Mem û Zînan* a yekem tercumeya *Mem û Zîna* Xanî ye û ya duyem jî telîf e ku bo *Mem û Zîna* Xanî wek nezîreyê hatiye nivîsîn. Muellif *Mem û Zîna* Xanî pêşî di sala 1856ê de tercumeyî tirkî kiriye, piştî 13 salan jî telîf/tenzîr kiriye. Di *Mem û Zîna* werger de mexlesên Faiq û Nezmî û di ya telîf de mexlesa Faiq bi kar aniye. (Tek 2017, r. 134-138). Eger em xulase bikin, li holê du *Mem û Zînên* tirkî yên cuda hene. Li gor nêrîna yekem yek ji wan ji aliyê Aşiq Osman Sîpkî û ya dî jî ji aliyê Ehmed

Faiq ve hatine nivîsîn, lêbelê li gor nêrîna duyem her du jî aji aliyê Ehmed Faiq ve hatine nivîsîn.

Ji bo pêzanînê li vê derê em dixwazin li nusxeyên van her du Mem û Zînan jî binêrin: Ya ku li gor nêrîna yekem ji aliyê Aşîq Osmanê Sîpkî (Nezmî) ve hatiye nivîsîn û li gor nêrîna duyem wergera Ehmed Faiq e du nusxeyên wê hene: Nusxeyek jê li Tehranê li Kutubxaneyê Meclisa Şûraya Millî di jimareya 9385an de tê parastin¹, nusxeya duyem jî di koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên kurdî de bi jimareya Kurd 38ê tê parastin. Ev Mem û Zîn ji aliyê Mustafa Öztürk (2017) û Ayhan Tek (2018) ve hatiye weşandin. Herçiqas ne mijara gotara me ye jî Mem û Zîna ku li gor her du nêrînan jî ji aliyê Ehmed Faiq ve wek telîf hatiye nivîsîn jî dîsa du nusxeyên wê hene. Yek jê li Stenbolê li Kutubxaneyê “Suleymaniyê”yê (Yazma Bağışlar, 894.35-1) û ya dî jî li Ankara li Kutubxaneyê “Türk Tarih Kurumu”yê (Y.I. 165) tê parastin. Ev Mem û Zîn jî aliyê Sırrı Dadaşbilge ve hatiye weşandin (Faik 1969).

Îcar niha em dikarin li argumanên ku ji bo van nêrînan bûne palpişt binêrin. Bêguman em dê herî zêde argumanên nêrîna duyem ku du muellifên cuda wek kesayetekî qebûl dike analîz bikin. Gelo xwediyê vê nêrînê Tek di vê hizra xwe de xwe spartiyê çî? Di bersiva vê de em dikarin bibêjin ku Tek xwe spartiyê mexlesên ku di van her du Mem û Zînan de hatine bikaranîn. Li gor Tek di her du Mem û Zînan de ji aliyê mexlesan ve rewşeke weha heye: Di Mem û Zîna telîf de tenê mexlesa “Faiq” û di Mem û Zîna werger de jî carekê navê Osman, du caran mexlesa “Faiq” û 12 caran jî mexlesa “Nezmî” hatiye bikaranîn (Tek 134). Li gor Tek di Mem û Zîna telîf de bikaranîna yek mexlesî ku ew jî “Faiq” e bi awayekî aşkera nîşan dide ku ev Mem û Zîn a Ehmed Faiq e. Bi heman rengî ji ber ku di Mem û Zîna werger de jî mexlesa “Faiq” hatiye bikaranîn, ev Mem û Zîn jî dibe ya Ehmed Faiq. Heçî mexlesa “Nezmî” ye ew dikare wek mexlesa duyem a Ehmed Faiq bê qebûlîkirin ku bikaranîna du mexlesan bi taybetî di nav kurdan de şêwazeke asayî ye (Tek 133-139).

Bêguman hebûna du mexlesan bo heman kesî tiştekî asayî ye, lêbelê bi baweriya me hebûna du kunyeyan bo kesekî ne tiştekî asayî ye. Li vê derê aşkera ye ku “Aşîq Osman Sîpkî” û “Ehmed Faiqê Bedlîsî” du kunyeyên cuda ne. Berî her tiştî navên wan cuda ne; yek Osman e û yê dî Ehmed e. Herweha nisbeyên wan jî cuda ne; Osman bo eşîra Sîpkîyan û Ehmed jî bo bajarê Bedlîsê hatine nisbetkirin. Bi baweriya me di vê rewşê de ya asayî ew e ku cudabûna kunyeyan cudabûna şexsan jî encam bidêre. Ji aliyê dî ve di Mem û Zîna Aşîq Osman Sîpkî de di beytekê de navê wî jî (Osman) derbas dibe ku ev yek di nisbetkirina berhemê de tu gumanan nahêle. Bi awayekî aşkera berhema ku tê de navê Osman derbas bibe ne pêkan e bo Ehmed Faiq bê nisbetkirin.

Eger em werin ser mijara beytên ku di wan de mexlesa “Faiq” derbas dibe ku argumana herî girîng a vê nêrînê ye, bi baweriya me, çawa ku Öztürk jî amaje pê kiriye (Öztürk 2017, r. 23), di van beytan de peyva “faiq” ne di pozîsyona

¹ Ji bo ku ev nusxe pêşkêşî me kir, em ji Hayrullah Acar re spasîyên ji dil pêşkêş dikin.

mexlesê de, bi wateya xwe ya ferhengî hatiye bikaranîn ku ew jî bilindî û raseriya ser tiştêkî ye. Di berhemê de bikaranînen peyva faiq bi vî rengê jêrîn in:

Ol padîşeh-i zaman-ı sabık
Gördü anı çün zamanda **faik**

Beg dedi ki siz görünce laik
Elbette bana da olsa **faik**

Bu Nazmiye sen olupsen üstad
Sözün ana **faik** oldu îcad

Dema mirov pê da diçe aşkera dibe ku di van beytan de peyvên “faiq” ne di pozîsyona mexlesê de, di wateya raseriyê de hatine bikaranîn. Ji ber ku Tek bi taybetî li ser beyta sêyem rawestiyaye (135), em ê jî teza xwe li ser vê beytê pratîze bikin. Li gor Tek di misraya duyem a vê beytê de (Sözün ana **faik** oldu îcad) “faiq” mexlesa helbestvan e û helbestvan di wê misrayê de xîtabî xwe kiriye û di misraya yekem a beytê de jî xîtabî Xanî kiriye. Li gor vê wateya beytê weha çê dibe: “(Ey Xanî) Ji ber ku tu ustadê vî Nezmîyî yî, ey Faiq gotinên te li ser bingeha yên Xanî hatin dahênan.” (Tek, 135). Lêbelê bi baweriya me li vê derê peyva “faiq” tenê di wateya xwe ya ferhengî de hatiye bikaranîn. Di vê rewşê de wateyeke weha li beytê dikeve: “(Ey Xanî) Ji ber ku tu ustadê vî Nezmîyî yî, gotinên te ser yên wî re hatine dahênan.” Bi baweriya me di şeweya yekem de ji aliyê rewanbêjiyê ve hinekî lengî jî derdikeve holê. Lewra dema di misraya yekem de xîtab ji bo kesekî cuda (Xanî) û di ya duyem de jî ji bo kesekî cudatir (faiq) tê kirin, di têgihştina beytê de zehmetî derdikeve holê ku ev li dijî regezên belaxetê ye. Lêbelê di şeweya duyem de tu lengî û zehmetiya têgihştinê tune ye. Bi kurtî li gor baweriya me di vê beytê de jî û di her du beytên pêşî de jî “faiq” ne mexles e. Di vê rewşê de jî mecal namîne ku berhem bo Ehmed Faiq bê nisbetkirin. Naxwe berhem ya Aşiq Osman Sîpkî ye ku hem navê wî, hem jî mexlesa wî (Nezmî) tê de hatiye bikaranîn. Herî dawî di vê biwarê de argumaneke dî ya ku em dixwazin bînin ziman ew e ku di tradîsyona edebiyata klasîk de ya standart ew e ku helbesetvanek berhemekê carekê telîf bike. Ev yek jî hizra ku Ehmed Faiq tenê Mem û Zînek nivîsiye bihêztir dike.

Eger em veşerî ser kojima jimara kesên ku di serdema klasîk de Mem û Zînê bi tirkî nivîsîne, cudahiya Aşiq Osman Sîpkî û Ehmed Faiq teqez dike ku jimara wan pênc e, ne çar. Niha li jêrê li ser esasê ku Aşiq Osman Sipkî kesayeteki cuda ye em dikarin derbasî beşa biyografîya Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî bibin.

2. ‘AKIFÊ WANÎ Û AŞIQ SİPKÎ

Dikare bê gotin ku vê kêliyê derheqê jiyana Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî de tekane çavkanî, têbîniyên A. Jaba yên destnivîs in ku derheqê berhemên destnivîs

ên ku di koleksiyona wî de cih digirin û nivîskarên wan berheman de nivîsîne. Jaba di nav van têbîniyan de beşeke serbixwe ji bo Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî terxan kiriye. Ev têbîniyên ku bi zimanê frensî hatine nivîsîn, di koleksiyona A. Jaba de di jimareya Kurd 54an de cih digirin (wr. 41a-43b). Li vê derê divê ev xal jî bê gotin ku agahiyên ku Jaba di van têbîniyan de dide di peydakirina çavkaniyên nû de jî dê rol bilîzin. Bi taybetî ji ber ku Jaba wezîfeyên burokratik ên Akifê Wanî bajar bi bajar pêşkêş kiriye, ev yek ji bo wî hêsantir e. Bi rastî jî di berhemeke bi navê *Bayezid Sancağı ve İdarecileri* (Karataş, 2014) de ku behsa rêvebirên sinceqa Bazîdê dike wek qeymeqamekî Bazîdê Akifê Wanî jî cih digire. Herçiqas di vê çavkaniyê de tenê behsa serdema rêvebiriya Wanî ya Bazîdê hatiye kirin jî, ev çavkanî ji bo me gelekî girîng e. Lewra ji aliyekî ve taserufên Wanî yên îdarî yên vê serdemê di çarçoveya belgeyên fermî de bi hûrgulî hatine tesbîtkirin, ji aliyekî dî ve jî hin xalên girîng ên bi jiyana wî ya giştî ve têkildar jî hatine dayîn. Bêguman eger Jaba behsa qeymeqamtiya Wanî ya Bazîdê nekiriba peydakirina vê çavkaniyê jî dê pir zehmet bûya. Ev jî girîngiya têbîniyên Jaba careke dî radixe ber çavan.

1.1. 'Akifê Wanî

Çawa ku li jorê jî hat gotin derheqê jiyana Akifê Wanî de di dest me de du çavkanî hene. Yek têbîniyên Jaba ne, ya dî jî berhema Karataş e. Ji ber ku têbîniyên Jaba hem tevahiya jiyana wî vedigire, hem jî derheqê Akifê Wanî de çavkaniya sereke ye, em dixwazin van têbîniyan li jêrê bi tevahî pêşkêş bikin² (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-42a):

“Akifê Wanî di tevahiya jiyana xwe de bi zimanên erebî, farisî û tirkî re mijûl bûye. Hafîzeyeke wî ya mezin hebûye û ji ber vê jî gelek helbestên helbestvanên navdar ji ber kirine. Xwendin û nivîsîna wî di van zimanan de gelekî baş bûye. Di demeke kurt de di nav kurdan de hatiye naskirin. Di bestekirina xezel û rubaiyan de şohreta wî çê bûye. Bi hêsanî kariye helbestan binivîse. Şohreta wî zû bala rêvebiran kişandiye. Loma jê re leqeba “efendî” hatiye dayîn. Di sala 1856an de bûye qeymeqamê Bazîdê. Li wê derê hizra nivîsîna helbestan bi zimanê tirkî pê re çê bûye û Mem û Zîna Xanî wergerandiye tirkî. Navê berhemê jî kiriye kulîlkên bêhnxweş ên evîne (Reyahîne ‘Eşq). Piştî ku 21 bend wergerandiye ji bo karên fermî ew gazî paytextê (Stenbol) kirine. Ji ber vê jî karê wergerê dide sekinandin û di nivî de dihêle. Yekemîn destkefta wî di warê berhemê de ew e ku di sala 1857an de dema derbasî Erzîrûmê dibe, wergera xwe pêşkêşî waliyê Erzîrûmê Xeyreddîn Paşa kiriye. Ew jî ji wergera wî gelekî kêfxweş bûye. Di navbera wan de hevaltî û dostaniyê dest pê kiriye. Hevaltiya wan gihaye wê astê ku walî keça xwe daye kurê Akifê Wanî Emîn Axa ku wê demê kesekî 18 salî û bê karûbar bûye. Akifê Wanî bi kurê xwe şanzî kiriye ku kurmancekî ji rêzê bûye “damad beg”. Piştî demekê Akifê Wanî bûye muteserîfê Batumê û di sala 1863yan de bêyî ku wergera xwe xilas bike li wê derê koçî dawî kiriye. Ez deyndarê wî me ku dema hatibû Erzîrûmê kopyayêke wê berhemê dabû min.”

² Ji bo ku têbîniyên Jaba ji zimanê frensî bo zimanê kurdî wergerandin, ez spasîya Şehab Welî û Yılmaz Özdil ferz dibînim.

Eger em van têbîniyan xulase bikin em dikarin bibêjin ku derheqê Jiyana Akifê Wanî de çar xalên girîng hatine dayîn. 1. Di ziman û edebiyatên erebî, farisî û tirkî de pispor e. 2. Şohreta wî pêşî li nav kurdan û piştî jî li nav rayedarên fermî yên Osmaniyan çê bûye. 3. Burokratekî girîng ê Osmaniyan e ku qeymeqamtî û muteseriftî kiriye. 4. Di 1863yan de koçî dawiyê kiriye. 5. Mem û Zîna xwe ya bi tirkî di sala 1856an de li Bazîdê nivîsiye.

Dema em li berhema ku behsa rêvebirên sinceqa Bazîdê dinêrin, berî her tiştî em dibînin ku di vê berhemê de kunyeya Akifê Wanî wek “Haci Mustafa Akif Efendî” hatiye dayîn. Ji vê jî em fêm dikin ku navê helbestvanê me ne ji Akif tenê pêk tê, di eslê xwe de helbestvanê me xwedî navekî murekkeb e ku ew jî Mustafa Akif e. Ji leqeba “haci” ku di kunyeya wî de cih digire em têdihigin ku Akifê Wanî bi mebesta îbadeta hecê sefera Hîcazê jî kiriye. Di dawiya kunyeyê de hebûna leqeba “efendî” paralelî agahiya Jaba ye jî. Di berhemê de serdema qeymeqamtîya Akifê Wanî ya Bazîdê wek 1856-1857 hatiye dayîn ku ev jî paralelî agahiya Jaba ye. Li gor berhemê Akifê Wanî li Wanê wezîfeya miftîtiyê jî kiriye û di sala 1845an de li ser vê wezîfê ye. Di esnayê vê wezîfeyê dema bûyera Bedîrxan Beg rû daye tercîha terefê dewletê kiriye û wê salê ketiye bin xizmeta dewletê û demên kurt li Maraş û Mûşê qeymeqamtî kiriye. Piştî demekê ketiye bin xizmeta leşkeriyê, lêbelê dîsa li Mûşê bûye qeymeqam û piştî Mûşê li Bazîdê dest bi qeymeqamtîyê kiriye (Karataş 2014, r. 150-155)

1. 2. Aşiq Osman Sipkî

Derheqê jiyana Aşiq Osman Sipkî de jî tekane çavkanî A. Jaba ye. Jaba di heman cihê de piştî ku behsa Akifê Wanî kiriye, derbasî Aşiq Osman Sipkî bûye. Agahiyên ku Jaba derheqê Aşiq Osman Sipkî de dide weha ne (Jaba, Kurd 54, wr. 42a-43b):

Aşiq Osman ji eşîra Sipkî ye ku eşîreke gelekî berbelav e. Niha li qezaya Eleşkirtê ku girêdayî Bazîdê ye dimînin û îro ji çend sed malbatan pêk tê û tê gotin ku belavbûyî û perakende ne. Sipkiyên ku ji eşîra xwe veqetiyane jiyaneke bêserûber derbas dikin. Ne bi qasî Akifê Wanî jî be, perwerdeya Aşiq Osman a farisî û tirkî gelekî baş bû. Bi xwendina xezelên Hafîz û stranên tirkî bûye helbestvanekî kurd. Di sala 1232 (1816/1817)an de hatiye Erzîrûmê û li wê derê dengbêjî kiriye. Waliyê Erzîrûmê Çapanoğlu ku kesayeteki bihêz û xwedî mal bûye, gelekî jê hez kiriye û li wê derê wek helbestvan û stranbêj ketiye bin xizmeta wî. Aşiq Sipkî li Erzîrûmê ji bo tirkan terka bikaranîna eşîra xwe (Sipkî) kiriye û navê “Aşiq Osman” bi kar aniyê. Çapanoğlu ewqas lê xwedî derketiye ku dewlemend bûye. Dewlemendiya wî gihaye wê astê ku herkesî xwestiye bibe hevalê wî. Di wê demê de kesekî ciwan e û ji halê xwe memnûn e. Lêbelê di dawiya jiyana wî de rewşa wî xirab bûye û ji bo helbestê hew îlham hatiyê. Hevalên wî yên li dora wî jî jê dûr ketine. Hemû pereyên xwe xerc kirine û veqetiyayê gundê xwe yê bi navê “Uznî” ku du saet dûrî Erzîrûmê bûye. Xweşbextane parçeyek erdê wî li wir hebûye. Li wir ji bo mirina hevalê xwe Akifê Wanî xemgîn bûye û dema li cîhana xwe ya derûnî veqetiyayê û ji bo mirina hevalê xwe giriye, hizra xilaskirina wergera nîvco û muhteşem ya Mem û Zîna Akifê Wanî pê re çê bûye. Werger di du salan de xilas kiriye û heman nav lê

kiriye. Lêbelê wergera Akifê Wanî ji ya wî xweştir e. Aşiq Sipkî xwestiye metnê hêsan bike, lêbelê Akifê Wanî xwestiye bi hevokên edebî û peyvên erebî û farisî ruhê mirov tetmîn bike. Lêbelê her du berhem jî bi qîmet in. Aşiq Osman piştî xilaskirina berhema xwe hêvî kiriye ku paşayekî wek Çapanoğlu peyda bike, berhema xwe pêşkêş bike û jê pere bistîne. Lêbelê bi ihtîmaleke mezin heta wê demê kes peyda nekiriye. Ji ber vê jî destûr nedaye ku kes berhema wî kopî bike. Gava ku min dê Erzirûm terk bikira piştî ku min çendîn soz danê ku ez belav nakim, min karî kopyayeke ku li pêş çavên min ji aliyê Aşiq Sipkî ve hat muqayesekirin jê bistînim.

Ji van zanyariyên ku ji têbîniyên Jaba tên bidestxistin nasnameya tarîxî ya Aşiq Osman Sipkî û biyografiya wî kêr zêde aşkera dibe. Bi saya wan em dikarin derheqê nasnameya wî de hin encaman bi dest bixin ku li jêrê hatine rêzkerin:

1. Navê wî Osman e. Di vê biwarê de divê bê gotin ku muellif di nav berhemê de jî navê xwe (Osman) bi kar aniye (Sipkî, Koleksiyona A. Jaba, Kurd 38, wr. 56a):

Mazhar ola lütf-ı Hakka her an

Mahrûm mekun tu ya Rab Osman

2. Ji eşîra Sipkan e ku navenda wan Elşekirt e û ji gundê Uznî ye ku dikeve aliyê Erzirûmê.

3. Întisabî tradîsyona edebiyata gelêrî ya tirkî kiriye. Em vê yekê ji leqeba “aşiq” a ku di kunyeya wî de cih digire fêrî dikin. Leqeba “aşiq” bi du şeweyan dikare bê şîrovekirin. Ya yekem wek têgeheke tesewifî ew kes e ku tûşî evîna îlahî û tesewifî bûye, ya duyem jî wek têgeheke edebiyata tirkî ya gelêrî ew helbestvanê gel e ku digel helbestan li sazê dixê. Herçiqas wek helbestvanekî serdema klasîk aşiqbûna mellifê me di wateya yekem de pêkan jî be, ji zanyariyên Jaba em têdigihin ku aşiqbûna wî di wateya duyem de ye. Lewra Jaba dibêje ku bûye dengbêjê Waliyê Erzirûmê Çapanoğlu û li wê derê dest bi bikaranîna navê “Aşiq Osman” kiriye. Ji aliyê dî ve em dizanin ku ev tradîsyona edebiyata tirkî li devera serhedê bi hêz e. Ev tev nîşan didin ku helbestvanê me bûye endamekî çanda aşiqan a edebiyata tirkî û di vê qonaxê de xwe wek Aşiq Osman daye nasandin.

4. Hevalê Akifê Wanî ye, lêbelê piştî wî koçî dawiyê kiriye. Ji agahiyên ku Jaba dide em têdigihin ku Sipkî dema di sala 1816an de çûye Erzirûmê ciwan e û dema di sala 1866-1867ê de wî û Jaba hev dîtine pîr bûye. Ji ber ku navbera her du tarîxan beramberî 50 salî tê, dikare bê texmînkirin ku dema çûye Erzirûmê di temenê 15-20 salî de ye. Dema em van salan jî li 50î zêde bikin temenê wî dibe 65-70 sal. Bêguman em nikaribin payan bikin jî, ew piştî dîtina Jaba jî (1866-1867) demekê jiyaye. Loma em dikarin bibêjin ku wî di çaryeka sêyem a sedsala XIXem de di temenê xwe yê raserî 70 salî de koçî dawiyê kiriye.

Di biwara serdema wî de em doneyekê jî ji berhema wî bi dest dixin. Lewra wî di dawîya berhema xwe de bi hesabê ebcedê tarîxa te'lîfa berhemê daye. Ji ber ku tarîxa te'lîfa berhemê di heman demê de serdema nivîskar jî nîşan dide ev xaleke girîng e. Beyta ku tê de bi hesabê ebcedê tarîxa te'lîfa berhemê hatiye dayîn ev e (Sipkî, Koleksiyona A. Jaba, Kurd 38, wr.59a):

*Tarîx-i kitaba tam oldi**Bu sözüme can xitam buldı*

Di vê beytê de nivîskar dibêje ku “Tarîxa nivîsîna berhemê tam çê bû: Ey can! Ev gotina min gihîşt dawiyê.” Ji îfadeya “*tarîx-i kitaba*”ya risteya yekem a vê malikê em têdigin ku nivîskar di vê malikê de tarîxa te’lîfa berhemê dide. Dema mirov malikê vedikole, derdikeve meydanê ku tarîx ji risteya duyem a beytê pêk tê: (بو سوزمه جان ختام بولدی / Bu sözüme can xitam buldı). Çawa tê zanîn di hesabê ebcedê de herfên ku bi elîfbêya erebî hatine nivîsîn jimarên diyarkirî nîşan didin û bi komkirina van jimarên tarîx derdikeve meydanê. Li jêrê yek yek herfên risteya duyem û di çarçoveya hesabê ebcedê de bergîndên wan ên jimarî û encama hesabê ebcedê hatine dayîn:

ب	و	س	و	ز	م	ه	ج	ا	ن	خ	ت	ا	م	ب	و	ل	د	ی
6	6	60	6	7	40	5	3	1	50	600	400	1	40	2	6	30	4	10

بو سوزمه جان ختام بولدی = 1273 (1856-1857)

Çawa tê dîtin komkirina van jimarên encama 1273ê derdixwe meydanê ku ev jî beramberî 1856-1857a mîladî tê. Bêguman bidestxistina vê tarîxê tiştê gelekî girîng e. Lewra çawa me got tarîxa nivîsîna berhemê serdema nivîskar jî nîşan dide. Ji vê tarîxê bi awayekî aşkera derdikeve meydanê ku ‘Aşiq Sipkî berhema xwe di sala 1856-1857ê de nivîsiye û di wê demê de li heyatê bûye ku ev zanyarî jî bi agahiyên Jaba re hevgirtî ye.

3. MEM Û ZÎNÊN ‘AKÎFÊ WANÎ Û ‘AŞIQ OSMAN SİPKÎ

Di vê beşê de em dê di çarçoveya zanista destnivîsariyê de li ser her du nusxeyên destnivîs ên Mem û Zînên tirkî ku di koleksiyona A. Jaba de cih digirin analîzeke kodîkolojîk bikin. Lêbelê berî ku em yek yek her du nusxeyan analîz bikin, em dixwazin di serî de ji bo xaleke ku bi her du nusxeyan re têkildar e sernavekî serbixwe vekin ku ew jî bikaranîna navekî taybet e di her du nusxeyên koleksiyona A. Jaba de.

3. 1. Navlêkirineke Taybet: “Riyazê ‘Eşq”

Taybetiyeke sereke a her du Mem û Zînên tirkî yên koleksiyona A. Jaba ew e ku her du jî şûna ku hevterîbê mijara xwe wek “Mem û Zîn” bên binavkirin bi navekî taybet hatine binavkirin. Di vê biwarê de xaleke dî ya balkêş ew e ku di xwendina vî navê ku bi elîfbêya Osmanî hatiye nivîsîn de di nav lêkolîneran de hevgirtinek çê nebûye û ev nav bi du şeweyan hatiye xwendin: “Reyahînê Eşq” û “Riyazê ‘Eşq”

Çi “Reyahînê Eşq”, çi “Riyazê ‘Eşq” be, aşkera ye ku ev navlêkirineke taybet e û bi qasî ku taybet e balkêş e jî. Lewra di tradîsyona edebiyata klasîk a Rojhilata Îslamî de berhemên ku li ser dastanên evîndariyê hatine nivîsîn, bi piranî bi navên pehlewaniyê çîrokê hatine binavkirin. Wek dastanên Leyla û Mecnûn, Yûsif û Zuleyxa, Ferhad û Şîrîn û Mem û Zînê. Ev yek hem di edebiyatên erebî, farisî û kurdî de, hem jî di edebiyata tirkî de wisa ye. Ji ber vê ye ku di van her du Mem û Zînên tirkî de ev şewaza cuda di navlêkirinê de wek xaleke enteresan û balkêş derdikeve pêş. Bivênevê li vê derê hin pirs divê

bên pirsirin: Gelo çima di navlêkirina van berheman de serî li şêwazeke cuda û derî tradîsyonê hatiye dayîn? Digel ku navê eslê berheman “Mem û Zîn” e, çima di tercumeyan de rîayetî navê eslî nehatiye kirin? Gelo muellifan bixwe serî li vê şêwaza cuda dane, yan dibe ku piştî wan hin kesên dî serî lê vê şêwazê dabîn?

Berî her tiştî divê em bizanin ku Mem û Zînên tirkî yên ku di koleksiyona A. Jaba de cih nagirin di vê mijarê de ji yên ku di koleksiyonê de cih digirin vediqetin. Lewra hem di Mem û Zînên Ehmed Faiq, Ebdulezîz Xalis û Zulfîqar Fethî de, hem jî di Mem û Zîna Aşiq Sipkî nusxeya Tehranê de ku ev tev derî koleksiyona A. Jaba ne, di navlêkirinê de serî li şêwazeke weha nehatiye dayîn û ji bo berheman navê Mem û Zînê hatiye bikaranîn. Loma bikaranîna navekî cuda wek taybetiyeke Mem û Zînên tirkî yên koleksiyona A. Jaba derdikeve pêş. Yanî sebebê vê navlêkirinê ne ew e ku Mem û Zîn bi tirkî ne, sebebê wê ew e ku ev Mem û Zîn di koleksiyona A. Jaba cih digirin. Îcar li vir tiştê ku divê bersivê jê re bê dîtin ev e: Gelo ev navlêkirin bi teserufa berhevkarên koleksiyona A. Jaba çê bûye, yan bi awayekî dî? Ji bo bersiva vê pirsê divê mirov berê xwe bide nusxeyên dî yên her du Mem û Zînên koleksiyona A. Jaba. Lewra di nusxeyên dî de hebûn û nebûna vî navî di ronkirina mijarê de dê roleke girîng bilîze. Bêguman ji bo vê yekê hebûna nusxeyên dî û bidestxistina wan girîngiyê bi dest dixê. Vê kêliyê em ji tu nusxeyên dî yên Mem û Zîna Akifê Wanî ne haydar in û tenê ji nusxeyeke dî ya Mem û Zîna Aşiq Sipkî haydar in ku ew jî nusxeya Tehranê ye. Dema em di biwara navê berhemê de li vê nusxeyê dinêrin em dibînin ku tê de wek hemû Mem û Zînên derî koleksiyona A. Jaba navê Mem û Zînê hatiye bikaranîn (Sipkî, 1273, wr. 1b). Bêguman ev xal ji bo ronkirina mijarê gelekî girîng e. Li gor vê em nikarin piştrast bikin ku Aşiq Sipkî bixwe berhema xwe bi navekî taybet bi nav kiriye. Lewra ji her du nusxeyan a ku navê “Riyazê ‘Eşq”ê tê de nehatiye bikaranîn ji ya ku tê de hatiye bikaranîn kevintir e. Di rewşên weha de jî bi awayekî siruştî nusxeyên kevin esas tên girtin. Ji aliyekî dî ve çawa ku li jêrê em dê behs bikin ev nusxe bi ihtîmaleke mezin nusxeya muellif bixwe ye ku di dijberiyên nusxeyan de her dem nusxeya muellif esas tê girtin (Eşîlan, 1994, r. 131-134). Ev tev nîşan didin ku ev navlêkirina taybet ne ji eslê berhemê ye, teserufeke ku piştê hatiye kirin ku ev jî bivênevê berê me dide koleksiyona A. Jaba.

Em dê ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê ji têbîniyên Jaba û taybetiyên her du destnivîsan sûd wergirin. Jaba di vê biwarê de dibêje ku pêşî Akifê Wanî navê “Reyahîne Eşq” li berhema xwe kiriye, piştê Aşiq Sipkî jî wek wî heman nav li ya xwe kiriye (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-43b). Li gor ku jaba dibêje dema Akifê Wanî di sala 1857an de hatiye Erzîrûmê kopyayek ji Mem û Zîna xwe daye wî ku nusxeya Mem û Zîna Akifê Wanî ya ku di koleksiyona A. Jaba de cih digire ev e. Dîsa ji agahiyên Jaba em têdigihin ku nusxeya Mem û Zîna Aşiq Sipkî di sala 1867an de hatiye istinsaxkirin. Yanî istinsaxa nusxeya Akifê Wanî 10 salan berî ya Aşiq Sipkî ye ku ev yek ji kaxezên destnivîsan jî dikare bê çavdêrîkirin. Ji ber ku navê berhemê

ku di serlewheya Mem û Zîna Akifê Wanî de hatiye nivîsîn ji aliyê kalîgrafîk ve bi tevahî wek kalîgrafiya berhemê ye em têdigihin ku ev nav ji orjînalê berhemê ye û ji ber ku muellif bixwe ev nav bi kar aniye di kopyaya wê de jî cih girtiye. Dema em di her du nusxeyan de bi awayekî berawirdî li navên wan dinêrin dîmenekî weha li pêşberî me ye: Navê berhemê di zehriyeya nusxeya Akifê Wanî de û di zehriye û serlewheya nusxeya Aşiq Sipkî de bi heman kalîgrafiye hatiye nivîsîn ku ev kalîgrafî ji kalîgrafiya metnên her du berheman cuda ye. Ji vê jî tê fêmkirin ku Jaba zehriyeyek ji nusxeya Akifê Wanî re amade kiriye/daye amadekirin û heman navê berhemê ku di serlewheyê de heye di zehriyeya wê de jî nivîsiye/daye nivîsîn. Piştê jî dema zehriye û serlewhe ji ya Sipkî re amade kiriye, heman nav li wan deran jî nivîsiye/daye nivîsîn. Yanî digel ku di nusxeya orjînal a Mem û Zîna Aşiq Sipkî de tune, xebatkarên koleksiyona A. Jaba navê nusxeya Akifê Wanî li wê jî kirine. Sebebê vê jî aşkera ye. Çawa di biyografiya muellifan de jî hat gotin Jaba her du muellif wek heval dane nasandin, nivîsîna Mem û Zîna Aşiq Sipkî bi mirina Akifê Wanî ve girê daye û Mem û Zîna Aşiq Sipkî wek dewama Mem û Zîna Akifê Wanî li qelem daye. Ji ber vê yekê jî bi awayekî siruştî heman navê Mem û Zîna Akifê Wanî li ya Aşiq Sipkî jî kiriye.


Bêguman li vê derê ev pirs dê bê pirsînin: Gelo dema Aşiq Sipkî nusxeya kopyakirî kontrol kiriye mudaxele yê wê yekê nekiriye? Lewra di esnaye kontrolê de eger ev nav dîtibe pêwîst e îtirazî wê desttêwerdanê kiribe. Bêguman ev pirs gelekî di cih de ye, lêbelê bersiva wê jî gelekî hêsan e. Çawa me got kalîgrafiya metnê berhemê bi şeweyekê û ya zehriye û serlewheya wê bi şeweyekê di ye. Ji vê jî tê fêmkirin ku zehriye û serlewhe piştê jî aliyê xebatkarên koleksiyona A. Jaba ve hatine amadekirin. Yanî ji ber ku piştî kontrola muellif (Aşiq Osman sipkî) di zehriye û serlewheyê de heman navê Mem û Zîna Akifê Wanî hatiye nivîsîn ku li jorê behsa sedemê wê hat kirin, muellif tenê metnê berhemê kontrol kiriye û bi awayekî siruştî rastî desttêwerdaneke ku pey wî re hatiye kirin nehatiye.

Di vê mijarê de xala dî ya ku em dixwazin li ser rawestînin, şaşiyek e ku ji aliyê Jaba ve di xwendina vî navê taybet ê mewzûbehs de hatiye kirin ku ev şaşî di eslê xwe de ji aliyê Ayhan Tek ve hatiye tesbîtkirin (Tek, 2017, 142). Dema em lê dinêrin em dibînin ku Jaba di nav xebatên xwe de kalîgrafiya vî navê taybet bi şaşî wek “Reyahînê ‘Eşq” (رياحين عشق) xwendiyê û latînîze kiriye. Kakila wê şaşiyê ew e ku ravebera terkîbê ku “riyaz” e wek “reyahîn” hatiye xwendin. Herçiqas ev şaşî cara pêşî ji aliyê A. Jaba ve hatiye kirin jî, wê dawiyê ji aliyê Mustafa Öztürk ve jî hatiye dubarekirin û berhema ku ji latînîzekirina metnê Mem û Zîna Aşiq Sipkî pêk tê ji aliyê Öztürk ve her bi şeweya “Reyahînê ‘Eşq”ê hatiye weşandin. Bêguman ji ber ku ev şaşî bi vê xebata Öztürk bûye malê raya giştî, mijar analîzeke bi hûrgulî heq dike.


Dema em taybetiyên asayî yên îmlaya wê terkîbê li ber çavan digirin, bi hêsanî tê dîtî ku xwendina bi şeweya “Reyahînê ‘Eşq” şaş e. Çawa ku Ayhan Tek jî amaje pê kiriye (Tek, 2017, 142), ji bo ku “reyahîn” be, pêwîst e di peyvê de herfa “yê”

du caran hatiye nivîsîn. Lêbelê di nav her du nusxeyan de li her çar cihên ku ev peyv hatiye bikaranîn herfa “yê” tenê careke hatiye bikaranîn. Li vir divê bê gotin ku ji bilî van çar cihên ku Tek jî amaje pê kiriye, di têbîniyên Jaba de jî ev nav du caran hatiye nivîsîn û di van her du cihan de berevajî her du nusxeyan herfa “yê” hatiye bikaranîn. Bi gotineke dî di van her du cihan de raveber tam li gor “reyahînê” hatiye nivîsîn. Bi baweriya me li vê derê kirasê heqîqetê li şaşiyê hatiye kirin û nivîs li gor xwendina şaş hatiye nivîsîn. Bi vî awayî du îmlayên navê berhemê derketine meydanê. Ji bo ku ev yek bê fêmkirin em dixwazin bi hûngulî li îmlaya raveberê binêrin. Çawa tê zanîn di destnivîsên bi elîfbêya erebî de herfa ض/Dad’ê ku di dawiya peyva “Riyazê” (رياض)ê de jî heye bi îmlayeke taybet tê nivîsîn. Pêşî giroverek, piştî wê niqirkek û piştî wê jî dûvikekî şikestî (şibhê~) tê xêzkirin. Îcar Jaba ev her sê hêmanên herfa ض/Dad’ê bi şaşî wek sê herfên cuda hizir kirine û grovera ض/Dad’ê wek ح/Ha, niqirka ض/Dad’ê wek ی/Ye û dûvikê wê jî wek ن/Nûn xwendine. Di encama vê de herfa ض/Dad’ê ku di dawiya peyva “Riyazê” (رياض)ê de cih digire, şûna ku tenê rola herfekê hilgire ser milê xwe, rola sê herfan hilgirtiyê ser milê xwe û bi vî awayî bûye “رحین”. Piştî dema “رحین” li herfên berî wê ku ر/Re û ی/Ye ne hatiye zêdekirin peyva “reyahîn”ê derketiyê meydanê. Lêbelê piştî di têbîniyan de peyva “reyahînê” bi awayekî dirust hatiye nivîsîn.


Niha jî em dixwazin li wêneyên orjînal ên raveberê binêrin û di çarçoveyan van wêneyan de îmlaya orjînal a peyvê analîz bikin. Li jêrê di wêneyên navên berhemê yên her du nusxeyan de aşkera tê dîtîn ku di navê berhemê de raveber ku ji milê rastê peyva yekem e (Riyaz/ رياض), bi herfa ض/Dad’ê diqede, ne bi hêceya bi “رحین”ê. Bi gotineke dî cihê ku wek “رحین” hatiye xwendin herfa ض/Dad’ê ye. Lewra pêşî grovera ض/Dad’ê, piştî niqirka wê, her dawî jî dûvikê wê tê. Çawa li jorê jî hat îzahkirin navê ku di serlewheya Mem û Zîna Akifê Wanî de cih digire orjînal (Wêne 1), yên dî piştî li ber wê hatine nivîsîn. Ev taybetiyên kalîgrafîk di wêneyan de bi hêsanî dikarin bîn dîtîn:




2. Riyazê Eşqa Akifê Wanî, Kurd 39, berg. Kurd 39, 2a.



1. Riyazê Eşqa Akifê Wanî, serlewhe




4. Riyazê Eşqa Aşiq Sîpkî, Kurd 38 berg. 1a, serlewhe.




3. Riyazê Eşqa Aşiq Sîpkî, Kurd 38

Nîşaneyeke dî ya vê rastiyê jî ew e ku peyva “Riyazê” (ریاض)ê li cihên dî yên berhema Akifê Wanî de jî bi heman taybetiyên kalîgrafîk ên ravebera navê berheman hatiye nivîsîn. Bo nimûne di terkîba “riyazê cennet” de ev yek dikare bê şopandin (Wêne 6). Eger di ravebera navê berhemê de xwendina bi şeweya “reyahîn” pêkan be, divê ev terkîba jêrîn jî bi şeweya “reyahîne cennet” bê xwendin ku ev ne pêkan e. Dîsa ji ber ku dawîya “ریاحین/reyahîne” bi “yê” û “nûn”ê diqede, pêwîst bû wek “sensin”a ku di Wêne 5’de bi “yê” û “nûn”ê diqede bihata nivîsîn.




6. Riyazê Eşqa Akifê Wanî, Kurd 39 wr. 41.




5. Kurd 38 1a, destpêk.

Li jêrê jî wêneyên navên berhemê yên ku di têbîniyên Jaba de hatine nivîsîn cih digirin. Çawa tê dîtin di van her du cihan de du cara herfa “yê” hatiye bikaranîn. Yanî peyv li gor “reyahîne” hatiye nivîsîn. çawa li jorê jî me got nivîs li gor xwendina şaş hatiye nivîsîn.



8. Kurd 54 w 41b.



7. Kurd 54 w 42a.

Bi kurtî hat fêmkirin ku Akifê Wanî navê “Riyazê ‘Eşq” (ریاض عشق)ê li Mem û Zîna xwe kiriye. Lêbelê ew nav ji aliyê xebatkarên koleksiyona A. Jaba ve bi şaşî wek “Reyahîne ‘Eşq” (ریاحین عشق) hatiye xwendin. Ji ber ku xebatkarên koleksiyona A. Jaba heman nav li Mem û Zîna Aşiq Sîpkî jî kirine, li ser nusxeya wî jî heman şeweya kalîgrafiyê bi kar anîne. Lêbelê piştî dema di nav têbîniyên Jaba de behsa navê berhemê hatiye kirin kalîgrafiyê li gor xwendina şaş (reyahîn) derketiye meydanê.

3. 2. Riyazê ‘Eşqa ‘Akifê Wanî

3. 2. 1. Danasîna Nusxeyê

1. Navê berhemê : *Reyahîne ‘Eşq [Riyazê ‘Eşq]*
2. Te’lif, tercume, şerh : Te’lif

3. **Navê nivîskar** : 'Akifê Wanî
4. **Cih (bajar û dewlet)** : Lenîngrad, Rûsya
5. **Navê Pirtûkxaneyê** : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. **Koleksiyon** : Koleksiyona A. Jaba
7. **Pirtûkxane no** : Kurd 39
8. **Navê xwedî** : [A. Jaba]
9. **Zimanê destnivîsê** : Tirkîya Osmanî
10. **Taybetiyên bergê** : Wêneyên rûyên derve yên bergê nehatine kişandin, lêbelê yên rûyên hundir hatine kişandin. Li gor rûyê hundir ê bergê bi kazeke sipî hatiye rûkirin û bi kenaran ve jî çermekî reş hatiye zeliqandin. Ji vê jî tê fêmkirin ku rûyê derve yê bergê bi çermekî reş hatiye rûkirin.
11. **Serbixwe-mecmû'e** : Serbixwe
12. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
13. **Zehriye** : Heye. Bi tirkîya Osmanî nav berhemê û bi frensî têbîniyên Jaba cih digirin.
14. **Rengê kaxezê** : Zer
15. **Rizîbûna kaxezê**: Kaxez ne rizî ye.
16. **Jimara wereqan**: 38 wereq in. Lêbelê di dawiyê de 36b, 37a û 37b vala ne.
17. **Ebadên kaxezê** : 35x22 (Ji têbîniyên arşîva A. Jaba)
18. **Cureya xetê** : Riq'e
19. **Îmla** : Îmlaya wê xweş e û xwendinbar e.
20. **Murekkeb** : Di tevahiya nivîsê de murekkeba reş hatiye bikaranîn.
21. **Cedwel** : Li dora rûpel cedwel nehatiye xêzkirin. Tenê di navbera her du sitûnan de xêzeke emûdî hatiye kişandin.
22. **Jimara beşan** : 21
23. **Sernav** : 21 sernav hene. Lêbelê ev sernav ne bi naveroka beşan re têkildar in, derheqê jimarebendiyê de ne.
24. **Jimara beytan** : 939
25. **Jimara rêzan** : 14
26. **Jimara sitûnan** : Di her rûpelî de du sitûn hene.
27. **Destpêka destnivîsê** : "*Bend-i Evvel. Sername-yi aşk(t) nam-ı Allah / Mahbûb-i qulûb-i kull heva-yi ah*" (wr. 2a).
28. **Dawiya destnivîsê** : "*Gam kaldı heman enîs û yarî / Gam ile musahebeti kari*" (wr. 36a).

3. 2. 2. Nirxandina Nusxeyê

Çawa tê zanîn nixê nusxeyekê bi arîkariya krîterên wek tambûn, dêrînî, fêambarî û hebûna teshîhan derdikeve holê (Bergsträsser, 2011, r. 1; Esîlan, 1994, r. 131-134). Em ê jî hewl bidin ku di vê beşê de di çarçoveya van pîvanan de li ser nusxeya Mem û Zîna Akifê Wanî ya di koleksiyona A. Jaba de nirxandinekê bikin û nixê nusxeyê derxin holê. Bêguman ev yek di çarçoveya tabloya tewsîfa nusxeyê de dê bê kirin ku di beşa jorîn de hatibû pêşkêşkirin.

Çawa ku di biyografiya Akifê Wanî de jî hat îzahkirin, muellif nekariye Mem û Zîna xwe ya tirkî xilas bike û ev berhema Zîna xwe nivco hiştiye ku tenê 21 beş tê de hene. Ji ber wê jî ev nusxeya ku di koleksiyona A. Jaba de cih digire nivco ye,

yanî ne tam e. Di dawiyê nusxeyê de qeyda istinsaxê tuneye ku ev ji bo berhemeke nîvco tişteki asayî ye. Ji ber vê jî cih û zemanê istinsaxê, herweha navê mustensix jî nayên dîtin. Lêbelê dema em li agahiyên Jaba dinêrin, ev xalên tarî li ber me ron dibin. Li gor van agahiyên Akifê Wanî di sala 1856an de dema li Bazîdê qeymeqam bûye ev Mem û Zîn nivîsiye û dema di sala 1857an de hatiye Erzîrûmê nusxeyek jê daye Jaba (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-43b). Ji vê agahiyê em têdighin ku ev nusxe ne nusxeya muellif e, lêbelê li ber ya muellif hatiye istinsaxkirin û sala istinsaxa wê jî 1857 e. Ji ber ku nusxe li ber nusxeya muellif hatiye zêdekirin nusxeyeke girîng e. Herweha ji aliyê dêrîniyê ve jî wek nusxeyeke kevin dikare bê qebûlîkirin. Xaleke dî ya ku divê bê gotin ew e ku zehriyeya nusxeyê ne ji aliyê mistensixê nusxeyê ve, piştî ji aliyê xebatkarên koleksiyona A. Jaba ve hatiye amadekirin. Ev yek ji cudahiya kaxez û kalîgrafiya wan tê fêmkirin. Îmlaya nusxeyê jî xweş e, loma jî ji aliyê fêmbariyê ve di asteke baş de ye.

Nusxe, ji aliyê hin taybetiyên standart ên destnivîsan û hunerên ku li ser kaxezên destnivîsan tînin îcrakirin ve gelekî lawaz e. Di nusxeyê de Besmele, serlewhe, cedwel û peyvên te'qîbê tunene. Jimarên rûpelan ne li gorî sîstema wereqan, li gorî sîstema rûpelan li jora rûpelan hatine nivîsîn. Yanî wereq 2a wek 1, wereq 2b wek 2 hatine jimarekirin. Herweha di jimarebendiyê de zehriye nehatiye hesibandin. Di navê vê sîstemê de berhem ji 69 rûpelan pêk hatiyê. Lêbelê piştî li jêra rûpelan li gorî sîstema wereqan bi qelemzîreçê ji nû ve jimare hatine dayîn û ji zehriyeyê hatiye destpêkirin. Li gorî ve berhem di 36a'yê de diqede. Aşkera ye ku ev sîstema jimareyê ya dirust yan ji aliyê xebatkarên koleksiyona A. Jaba, yan jî piştî wan bi ihtîmaleke mezin ji aliyê Rudenko ve hatiye kirin ku katloga koleksiyona A. Jaba ji aliyê wê ve hatiye weşandin.

Ev nusxe herçiqas ji aliyê fêmbarî û dêrîniyê ve nusxeyeke baş e jî, nivcobûna wê wek kêmasiyeke pir mezin derdikeve pêş. Xweşbextane ji daneyên dîtir dem û cihê istinsaxê tînin zanîn. Nusxe digel hemû kêmasiyên xwe di çarçoveya zanyariyên berdest de tekane nusxeya Mem û Zîna Akifê Wanî ye, loma jî xwedî girîngiyeke mezin e.

3. 3. Riyazê 'Eşqa 'Aşiq Sipkî

3. 3. 1. Danasîna Nusxeyê

1. Navê berhemê : Riyazê 'Eşq
2. Te'lîf, tercume, şerh : Te'lîf
3. Navê nivîskar : 'Aşiq Sipkî
4. Cih (bajar û dewlet) : Lenîngrad, Rûsya
5. Navê Pirtûkxaneyê : Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngradê
6. Koleksiyon : Koleksiyona A. Jaba
7. Pirtûkxane no : Kurd 38. Ev jimare hem li ser klasora arşîva A. Jaba, hem jî li ser rûpelê hundir yê bergê hatiye nivîsîn.
8. Zimanê destnivîsê : Tirkî

9. **Taybetiyên bergê** : Ji ber ku wêneyê bergê nehatiye kişandin taybetiyên bergê ne aşkera ne. Lêbelê li gor wêneyên dijîtal berg jî ji cinsê kakeza berhemê ye.
10. **Serbixwe-mecmû'e** : Berhem serbixwe ye û ne di nav mecmû'eyekê de ye.
11. **Tarîxa telîfê** : 1283 (1866-1867)
12. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
13. **Zehriye** : Li ser zehriyeyê bi Frensî ev îfade heye:
14. **Rengê kaxezê** : zera vekirî
15. **Te'mîra kaxezê** : Di 58b û rûpelê dawî de cihekî qetandî bi bendeke şeffaf hatiye te'mîrkirin.
16. **Jimara wereqan** : 59 wereq in.
17. **Ebadên kaxezê** : 35x 22 (Ji têbîniyên arşîva A. Jaba).
18. **Cureya xetê** : Riq'e
19. **Îmla** : Îmlayeke xweş e û bê hereke ye. Tenê di hin cihan de murekkeba nivîsê hinekî belav bûye, yan jî rijiyaye, lêbelê peyv tên xwendin. Bo nimûne di wereq 22b'yê de di misraya dawî de "qatdi canin", di wereq 53b2yê de "qebrine çûn" û di wereq 56 b'yê de "pîr dedikî bana oldu" 58b "elden ele"
20. **Murekkeb** : Di tevahiya destnivîsê de tenê murekkeba reş hatiye bikaranîn.
21. **Cedwel** : Li dora rûpelan cedweleke çarkoşe ya sitûnî hatiye xêzkirin. Herweha di nav vê cedwelê de jî du cedwelên sitûnî hatine bicihkirin. Yek ji wan jî bo misrayên yekem, ya dî jî ji bo misrayên duyem ên menzûmeyê ne. Cedwel, heta bi 24 b'yê yekxêzî, ji 25a'yê şûnde duxêzî ye. Hin xêz derketine derve, hin xêz jî xwehr in. Li sêçar cihan beytên dawî li ser cedwela jêrîn hatine nivîsîn.
22. **Jimara beşan** : 41 beş in.
23. **Sernav** : 40 sernav hene. Beşa yekem bê sernav e. Sernav jî wek metnê bi murekkeba reş hatine nivîsîn. Sernav bi farisî ne.
24. **Jimara beytan** : 1923
25. **Jimara rêzan** : Di çarçoveya rûpelên tam tijî de piraniya rûpelan jî 17 rêzan (beytan) pêk hatine. Bi qasî 20 rûpelan jî 18 rêzan û rûpelek jî (wr. 25a) jî 16 rêzan pêk hatiye.
26. **Jimara sitûnan** : Hemû rûpelên berhemê jî du sitûnan pêk hatine.
27. **Peyva te'qîbê** : Peyva te'qîbê bi piranî tune. Tenê li pênc cihan peyva te'qîbê hatiye nivîsîn (wr 12b, 24b , 36b û 46b, 58 b).
28. **Qeyda istinsaxê** : "Temmet el-Kitab bi 'ewni'llah el-melik el-wehhab senet 1283." (Kitêb bi arîkariya Xudayê melik û wehhab di sala 1283yan de tamam bû.) (wr. 59a).
29. **Tarîxa istinsaxê** : 1283 (1866-1867).
30. **Teshîh** : Li ser destnivîsê hin teshîh hatine kirin.
31. **Hamiş/derkenar** : Di wereq 46b'yê de du peyvên ku di wan de herfa herfa "Nûn"ê wek tevahiya menzûmeyê bi îmlaya riq'eyê hatiye nivîsîn (sen û lebin), li derkenarê di kêleka beytan de li gor îmlaya nesxê bi "Nûn"ên vekirî hatine nivîsîn.
32. **Destpêka destnivîsê** : "Sername-yi name ism-i Allah / İsmi ile her iş tamam vallah" (wr. 2a).
33. **Dawiya destnivîsê** : "Tarîx-i kitabe tam oldı / Bu sözüme can xitam buldu" (wr. 59a).

3. 3. 2. Nirxandina Nusxeyê

Em dê di bin vî sernavî de jî hewl bidin ku ji aliyê krîterên standart ve Mem û Zîna Aşiq Sipkî nusxeya koleksiyona A. Jaba binirxînin. Dema em ji aliyê tambûnê ve li nusxeyê dinêrin, em dibînin ku nusxeya destnivîs a Mem û Zîna Aşiq Sipkî ku di koleksiyona Jaba de cih digire nusxeyek tam e. Ev nusxe ji zehriyeyê (wr. 1a) heta bi wereqa dawî (wr. 59a) ku tê de qeyda istinsaxê cih digire bê kêmasî gihîştîye roja me. Bi awayekî siruştî di nusxeyên tam de di zehriye û wereqa dawî de zanyariyên girîng cih digirin. Di vê nusxeyê de jî li ser zehriyeyê navê nivîskar ('Aşiq Sipkî) û navê berhemê (Riyazê 'Eşq) û di qeyda istinsaxê de jî tarîxa istinsaxê hatiye dayîn (1283). Ev nusxe ji aliyê tambûnê û hebûna van zanyariyan ve nusxeyeke binirx e.

Ji aliyê qeyda istinsaxê ve divê bê gotin ku di vê qeydê de zanyariyên wek cihê istinsaxê, yan jî yên derheqê nasnameya mustensix de nehatine dayîn, lêbelê qet nebê di vê qeydê de tarîxa istinsaxê cih digire. Herçiqas qeyda istinsaxê ne tekûz e jî, hebûna tarîxa istinsaxê ji bo me girîng e. Lewra ev yek ji bo tesbîtkirina temenê nusxeyê û herweha dêrîniya nusxeyê doneyeke girîng dide destê me.

Ji bo ku em dêrîniya nusxeyê binirxînin, em dê hem ji tarîxa istinsaxê ya nusxeya Jaba, hem jî ji tarîxa te'lîfa berhemê ku di beyta dawî ya berhemê de bi hesabê ebcedê hatiye dayîn (bnr. beşa biyografiya Aşiq Osman Sipkî) sûd wergirin. Tarîxa istinsaxa nusxeya Jaba 1283 (1866-1867) û tarîxa telîfa berhemê jî 1273 (1856-1857) ye. Bêguman rûbirûkirina van her du tarîxan dê encamên girîng derxe meydanê. Ya herî girîng ew e ku zanîna tarîxa te'lîfa berhemê di tesbîtkirina nusxeyên eslî û yên kopî de roleke aşkera dilîze. Dema em li her du tarîxan (1273 û 1283) dinêrin, em dibînin ku tarîxa te'lîfê 10 salan berî tarîxa istinsaxê ye. Li gor vê nusxeya Riyazê Eşqa Aşiq Sipkî ya ku di koleksiyona A. Jaba de cih digire 10 salan piştî tarîxa te'lîfa berhemê hatiye istinsaxkirin. Ev jî nîşan dide ku ev nusxe ne nusxeya muellif e, nusxeyeke kopî ye û ji aliyê mustensixekî ve hatiye istinsaxkirin. Agahiyên ku Jaba jî dide vê yekê piştrast dikin. Lewra Jaba dibêje ku ev nusxe li ber nusxeya orjînal hatiye zêdekirin (Jaba, Kurd 53, wr. 6b). Lêbelê ji ber ku di qeyda istinsaxê de navê mustensix nehatiye dayîn, em nizanin berhem ji aliyê kê ve hatiye istinsaxkirin.

Madem ev nusxe nusxeyeke kopî ye, bi awayekî mentiqî ihtîmal heye ku nusxeya muellif, yan jî hin nusxeyên di yên istinsaxkirî jî gihîştîbin roja me. Çawa ku berî niha jî derbas bû, Bi rastî jî em dibînin ku nusxeyeke di ya vê berhemê li Tehranê tê parastin ku li jorê behsa wê hatibû kirin. Di qeyda istinsaxê ya vê nusxeyê de tarîxa istinsaxê wek 1273 (1856-1857) hatiye dayîn (Sipkî, 1273, wr.) ku ev tarîx di heman demê de tarîxa telîfa berhemê ye jî. Bi gotineke vekirî, sala telîfkirina berhemê û sala istinsaxa vê nusxeyê yek e. Ev jî nîşan dide ku bi ihtîmaleke mezin nusxeya Tehranê nusxeya muellif e. Eger em nusxeya Tehranê wek nusxeya muellif qebûl bikin, pêwîst e em wê ji bo nusxeya Jaba wek nusxeya binema qebûl bikin. Lewra Jaba bixwe gotiye ku ev nusxe li ber nusxeya muellif hatiye istinsaxkirin û ji aliyê nivîskarê berhemê ve hatiye kontrolkirin.

Bêguman ji bo gihîştina encamekê di vê biwarê de berawirdkirina nusxeya Tehranê û nusxeya koleksiyona A. Jaba dê roleke mezin bilîze. Li gor krîterên zanista destnivîsariyê, eger piştî berawirdkirinê di navbera her du nusxeyan de wekheviyeke tam hebe, bi taybetî eger ev wekhevî di şaşiyên de jî bê dîtin, ji wan nusxeyan a zû ji ya dereng re dibe binema, ya dereng jî dibe kopyaya wê (Esîlan1994; el-Munecid 1976; Togan1985, r. 86-88). Loma ji bo ku em jî

bigihîjin encamekê divê em van her du nusxeyan berawird bikin. Ji ber ku Mustafa Öztürk metnê rexneyî yên van her du nusxeyan amade kiriye, em ê jî di berawirdkirina her du nusxeyan de xwe bispêrin vî metnê rexneyî ku ji aliyê Öztürk ve hatiye amadekirin. Li gor tesbîten Öztürk (r. 29-31) di navbera metnên her du nusxeyan de ferqeke mezin tune ye û ev yek ji hindikayiya cudahiyên her du nusxeyan ên ku ji aliyê wî ve di aparatên de hatine nîşanan jî tê fêmkirin. Zêdebarî vê her du nusxe di hin şaşiyên de jî hevbeş in. Bo nimûne di her du nusxeyan de peyva “gündüz” bi şeweyeke şaş wek “günüz” û terkîba “pîş-i Mîre” jî bi şeweyeke şaş wek “pîş û Mîre” hatine nivîsîn. Ji bilî van tesbîtan Öztürk behsa hin sererastkirinên ku piştê li nusxeya Tehranê hatine zêdekirin kiriye ku ev sererastkirin di nusxeya Jaba de tune ye û ji bo vê jî du mînak dane. Ya yekem ev malika jêrîn e ku di nusxeya Tehranê de li ser peyva “edem” xêz hatiye kişandin û wek “edemden” ji nû ve hatiye nivîsîn.

Ketm-i **edem** oldı cümle peyda

İbda' kılan ana heyûla

Wate:

Her tişt ji korbûna tunebûnê derketin û peyda bûn.

Xweda ji wan re heyûlayek afirand.

Mînaka duyem jî malika jêrîn e ku di navbera di nusxeya Tehranê de “fakiri barî” bi şeweya “fakir ü barî” hatiye sererastkirin:

Nakd u zer ü sîm idüp nisarı

Şad eyliyegör **fakiri barî**

Wate:

Pere, zêr û zîv belav bike

Bila Xweda feqîr şad bike.


Öztürk, di gihîştina encamê de ev tesbîta dawî esas girtiye û ji ber nebûna sererastkirinên navborî di nusxeya Jaba de, gihîştîye wê encamê ku nusxeya Jaba ne li ber nusxeya Tehranê hatiye istinsaxkirin.

Eger em daneyên ku Öztürk dide binirxînin, ji ber girîngiya wê em dê pêşî li sererastkirinên ku di nusxeya Tehranê de cih digirin û di nusxeyan Jaba de cih nagirin binêrin. Berî her tiştî ne dema nivîsîna sererastkirinên nusxeya Tehranê diyar e, ne jî delîleke teqez di dest de heye ku ew sererastkirin ji aliyê muellif ve hatine kirin. Ji aliyê dî ve divê bê gotin ku her du sererastkirinên ku wek mînak hatine dayîn, ne ji bo teshîha metnê berhemê hatine nivîsîn. Lewra eger em wisa qebûl bikin, yanî eger em wan sererastkirinan wek metnê dirust qebûl bikin, ji aliyê şewaz û teknîka helbestê ve di beytan de şaşî derdikevin holê ku ne pêkan e nivîskar Aşiq Sîpkî şaşiyên wisa bike. Di malika yekem de eger em peyva

“edem” wek “edemden” bixwînin, şaşıyêke aşkera ya kêşa erûzê derdikeve holê û ahenga ku di tevahiya metnê berhemê de heyî di vê beytê de têk diçe. Ne pêkan e nivîskarê ku tevahiya berhema xwe bi awayekî serkeftî bi weznê “mef’ûlu mefa’ilun fe’ûlun” nivîsiye, bi awayekî ku weznê têk bibe forma dirust xêz bike û şûna wê formeke şaş binivîse.

Heçî sererastkirina duyem e, ew jî ji aliyê wateyê ve şaş e. Lewra nivîskar di “Şad eyliyegör fakiri barî” de behsa şadbûna kesên feqîr dike. Loma bikaranîna Waw/و di navbera “fakir” û “barî” de dê şaşıyêke wateyî derxe holê. Lewra di vê rewşê de behsa şadbûna feqîran û kesên dî bi hev re derdikeve holê ku mebesta nivîskar ne ev e. Di encamê de tê fêmkirin ku ne pêkan e ev sererastkirinên ku encamên şaş didin ji aliyê muellif ve hatibin kirin. Aşkera ye ku ev sererastkirin, çî bi mebesta sererastkirinê be, çî bi mebesta îzah û şîrovevê be ferq nake, ji aliyê kesekî dî ve hatine kirin. Ji ber vê jî nebûna van sererastkirinan di nusxeya Jaba de nabe asteng ku nusxeya Jaba li ber ya Tehranê hatibe istinsaxkirin. Tiştêkî asayî ye ku nusxeya Jaba berî nivîsîna wan sererastkirinan li ber ya Tehranê hatibe zêdekirin, yan jî ew sererastkirin ji ber ku encamên şaş didin di istinsaxê de li ber çavan nehatibin girtin.

Wek xulase em dikarin bibêjin ku nusxeya Tehranê nusxeya muellif e. Li gor agahiyên Jaba nusxeya Jaba li ber ya muellif hatiye istinsaxkirin. Wê demê nusxeya Jaba li ber ya Tehranê hatiye istinsaxkirin. Jixwe bi awayekî yekpareyî metnên nusxeya Jaba û nusxeya Tehranê wek hev in û zêdebarî vê şaşıyên wan jî wek hev in. Bêguman ev tev daneyên girîng in ku hebûna pêwendiyêke bihêz di navbera nusxeya Jaba nusxeya Tehranê de nîşan didin û ji ber ku ya Tehranê kevintir ew dibe nusxeya eslî û ya Jaba jî dibe kopyaya wê. Yanî bi awayekî aşkera derdikeve holê ku nusxeya Jaba li ber nusxeya Tehranê hatiye istinsaxkirin ku ev yek li jêrê jî hatiye şematîzekirin:



Şema: Şecereya her du nusxeyên Riyazê Eşqê

Ji aliyekî dî ve em dibînin ku sala istinsaxa nusxeya koleksiyona A. Jaba û sala birina wê bo Rûsyayê yek e. Lewra nusxe di sala 1283 (1866-1867)ê de hatiye istinsaxkirin û Jaba jî di navbera salên 1856-1867an de xebitiye. Ev jî nîşan dide ku nusxe di sala dawî ya Jaba de hatiye istinsaxkirin ku Jaba bixwe jî ev yek îfade kiriye (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-43b). Dîsa aşkera ye ku Jaba ev nusxe her wê salê şandiye Rûsyayê. Dîsa çawa Jaba jî îfade kiriye (Jaba, Kurd 54, wr. 41a-43b) muellifê berhemê ‘Aşiq Sipkî di sala (1283/1866-1867) de li Erzirûmê bûye û ev nusxe li ser israra Jaba li Erzirûmê li ber nusxeya muellif hatiye istinsaxkirin û muellif jî ev nusxe kontrol kiriye. Çawa ku Jaba jî gotiye Wisa tê fêmkirin ku di çarçoveya berhevkarîya koleksiyona A. Jaba de bi mebesta ku nusxeyekê ji

berhema Aşiq Sipkî bibin Rûsyayê, li ber nusxeya wî ya orjînal nusxeyeke nû hatiye istinsaxkirin ku ew jî nusxeya Jaba ye. Bi gotineke dî ji ber ku nexwestine nusxeya muellif bibin Rûsyayê, li ber wê nusxeyeke nû hatiye istinsaxkirin û ji bo ku nusxeya ku dê biçe Rûsyayê tekûz be ji aliyê nivîskar ve hatiye kontrolkirin. Lêbelê çawa em dê li jêrê li ser rawestin ev nusxe ji aliyê huner, estetîk û teknîkên destnivîsariyê ve lawaz e û ev jî nîşan dide ku ji bo ku istinsax zû xilas bibe hinekî lez hatiye kirin. Her çî be ev nusxe li ber nusxeya muellif hatiye zêdekirin û loma jî ji aliyê dêrîniyê nusxeyeke girîng e ku piştî nusxeya muellif tenê bi 10 salan hatiye istinsaxkirin û di rêza duyem de tê.

Gelo nusxeya muellif çawa gihaye Tehranê? Li gor agahiyên ku Mustefa Dehqan di vê biwarê de dide nusxeya muellif berê di destê malbateke Îranî ya tacir bi navê Sultan el-Quraî de bûye û di sala 1969ê de ji vê malbatê Ca'fer Sultan el-Quraî ev nusxe teslîmî Kutubxaneya Meclisa Şûraya Millî kiriye. Pêwendiyên vê malbatê yê tîcarî li devera rojhilatê Tirkiyeyê, yan jî li Ermenistan û Azerbeycanê bi malbateke tirk a tacir re hebûye. Bi ihtîmaleke mezin vê malbatê ev nusxe ji cihekî wek Kurdistana Tirkiyeyê, yan jî Ermenistana Rojava kirîne (Dehqan 2017, r. 55). Li vir tiştê girîng ew e ku Dehqan bêyî ku muellif û devera wî bizane ev agahî dane.

Di nav vê peywendê de em dixwazin pirsgerêka navê mustensix jî bînin rojevê. Çawa li jorê jî hatibû gotin di qeyda istinsaxê de navê mustensix nehatibû dayîn. Li gor ku muellif Aşiq Osman Sipkî nusxeya Jaba kontrol kiriye ew bixwe ne mustensix e. Wê demê mustensix xebatkarekî koleksiyona A. Jaba ye. Gelo dibe ku ev kes Bazîdî be? Dema em lê dinêrin em dibînin ku ev nusxe naşibe berhemên dî yê ku di koleksiyona A. Jaba de ji aliyê Bazîdî hatine istinsaxkirin. Bi rastî jî Mewlûda Bateyî (Kurd 9), Nûbihara Biçûkan (Kurd 22), Leyla û Mecnûn (Kurd 31) û Adat û Rusûmatname (Kurd 34) ku Bazîdî istinsax kirine, hem di zehriyeyan de, hem di qeydên istinsaxê de bi şêwazeke hevpar hatine amadekirin. Lêbelê di vê bê gotin ku Bazîdî ev hemû di sala 1274 [1858-59]ê de istinsax kirine. Heçî nusxeya Mem û Zîna Aşiq Sipkî ye ew di sala (1283/1866-1867)ê hatiye istinsaxkirin. Eger em di nav 9 salan de guherîna kalîgrafiya Bazîdî wek tiştêkî asayî bibînin, wê demê Bazîdî wek mustensixê vê nusxeyê jî dikare bê hizirkirin.

Eger em hinekî jî ji aliyê huner, estetîk û teknîkên destnivîsariyê ve li nusxeyê binêrin, em dê bibînin ku nusxe ji van aliyên ve gelekî lawaz e. Lewra di zehriyeyê de, yan jî di rûpelên pêşî û dawiyê de tezhîb qet tune. Di vê çarçoveyê de di rûpelê pêşî de serlewhe jî tune. Di cedwelê de tu estetîk li ber çavan nehatiye girtin. Cedwel heta bi 24b'yê yekxêzî, ji 25a'yê şûnde duxêzî ye. Hin xêz derketine derve, hin xêz jî xwehr in. Di sê-çar rûpelan de beytên dawî li ser cedwela jêrîn hatine nivîsîn. Rûpelekî bi cedwel wek zehriye hatiye bikaranîn ku diviyabû zehriye bê cedwel bûya. Dîsa di binê wereqên b'yê de peyva te'qîbê nehatiye bikaranîn. Kêmasiyeke dî jî ew e ku wereq 1b vala hatiye hiştin.

Di sîstema jimarebendiyê de jî gelek qelsî hene. Berî her tiştî jimarebendiyê nusxeyê ne li gor sîstema wereqên destnivîsan hatiye sazkirin. Li jora wereqan bi murekkeba reş li gor sîstema kitêbên çapkirî bo her rûpelî jimare hatine danîn. Herweha zehriye nehatiye jimarekirin. Dîsa jimareya 1ê du caran hatiye danîn: Hem li ser wereq 2a'yê, hem jî li ser wereq 2b'yê. Ya xirab ew e ku jimarebendî li ser bingeha vê şaşiyê hatiye domandin û berhem bi jimareya 114an qediyaye.

Lêbelê pêwîst bû bi jimareya 117an qediyaba. Kêmasiyeke dî jî ew e ku cihekî sabit ji bo jimarekirinê tuneye. Carinan li milê rastê, carinan li milê çepê, carinan jî li her du milan (wr.26a) jimare hatine nivîsîn. Ev şaşiyên di jimarebendiyê de piştî ji aliyekî pisporekî/pisporekê ve hatine sererastkirin û li jêra wereqan bi qelemzîreçê bi awayekî dirust li gor sîstema wereqê jimare hatine danîn ku çawa di beşa nusxeya Akifê Wanî de jî me got ev pispor ji kurdologên Rûsan kesekî wek Jaba û Rudenko ye. Jimareya 1ê li gor standardê li ser zehriyeyê hatiye danîn û nusxe bi awayekî durist heta bi 59ê hatiye jimarekirin. Nusxe bi 59a'yê diqede û 59 b vala ye.

Nusxeya Jaba ji aliyê fêmbariyê û hebûna teshîhan ve jî nusxeyeke binirx e. Lewra bi îmlayeke xweş û fêambar hatiye nivîsîn. Di hamişan de qeydên wek muqabele, sema', îcazet, û qiraetê ku di fêmbariyê de rol dilîzin tunene. Lêbelê li ser nusxeyê gelek teshîh hatine kirin. Di vê çarçoveyê de bi heman rêbazê hin peyv hatine jêbirin û şûna wan peyvîne nû hatine nivîsîn. Di van cihan tevan de dewsa peyva jêbirî maye û peyvên ku nû hatine nivîsîn jî bi qelemeke cuda hatine nivîsîn. Peyvên ku di çarçoveya teshîhê de ji nû ve hatine nivîsîn ev in: ricet, içre (14a), ciwanî (15b), 'elîm (19b) nazenîni (21a), herîsin, xesîsin (22b), 'izzet (26a) sefa, hep (28b), ger (33a), hemra, senden (58b), edeb, zulfîqar telaşe (29a), nigarim (39b). Herweha hin peyv jî hatine zêdekirin. Bo nimûne di 19b'yê de "qildi" û di 33a'yê de "zerre" piştî hatine zêdekirin (ol zerre sifata Zîn-i mehzûn). Çawa ku li jorê hat gotin ev nusxe ji aliyê Aşiq Osman Sipkî ve hatibû kontrolkirin. Loma em bi hêsanî dikarin bibêjin ku kesê ku ev teshîh kirine Aşiq Osman Sipkî ye. Bêguman nusxeyeke ku ji aliyê muellifê berhemê ve kontrola wê hatibe kirin, xwedî nirxekî taybet e.

4. ENCAM

Wek diyardeyeke ku di encama pêwendiyên edebiyata kurdî û tirkî de derketiye meydanê di serdema Osmaniyan de nivîsîna Mem û Zînê bi zimanê tirkî bûye wek kevneşopiyekê û vê kêliyê bi qasî ku tê zanîn ji aliyê pênc kesayetên kurd ve bi zimanê tirkî Mem û Zîn hatine nivîsîn. Kesên ku di vê serdemê de Mem û Zîna Xanî veguhastine tirkîya Osmanî ev in: Ehmed Faiq, 'Ebdul'ezîz Xalis, Zulfîqar Fethî, Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî (Nezmî). Di koleksiyona A. Jaba de jî yek a Akifê Wanî û yek jî ya Aşiq Osman Sipkî du nusxeyên Mem û Zînê bi tirkî cih digirin.. Di vê gotara ku li ser van her du nusxeyan û muellifên wan hatiye amadekirin de çendînc encam hatin bidestxistin.

Di koleksiyona A. Jaba de hebûna du nusxeyên Mem û Zînê bi tirkî ku ji aliyê du muellifên cuda ve hatine nivîsîn ji aliyê parastin û veguhestina wan bo roja me tiştêkî girîng e. Vê kêliyê tekane nusxeya Mem û Zîna tirkî ya Akifê Wanî û yek ji du nusxeyên Mem û Zîna Aşiq Osman Sipkî di vê koleksiyonê de ne. Her du nusxe ji aliyê dêrîniyê ve nusxeyên baş in. Lewra li ber orjînalên wan bo Jaba hatine zêdekirin û piştî nusxeya muellif di rêza duyem de ne.

Nivîskarên van Mem û Zînan Akifê Wanî û Aşiq Osman Sipkî du kesayet in ku heta îro tam nehatine naskirin. Akifê Wanî pêşî li Wanê miftîti kiriye, piştî jî heta bi mirina xwe di mulkiyeya Osmaniyan de wek qeymeqam (Maraş, Mûş, Bazîd) û muteserif (Batum) xebitiye û di sala 1863yan de li Batumê koçî dawiyê kiriye. Akifê Wanî di sala 1856an de dema li Bazîdê qeymeqam bûye Mem û Zîna

xwe nivîsiye, lêbelê ji ber ku ji Bazîdî veqetiyaye berhema xwe ya ku heta bi beşa 21ê nivîsiye nivco hiştiye û tamam nekiriye. Dema di sala 1857an de hatiye Erzîrûmê Jaba ji bo xwe nusxeyek daye istinsaxkirin. Nusxeya ku niha di koleksiyona A. Jaba de cih digire ev e. Nusxeya Wanî herçiqas nusxeyeke nivco ye jî, ji ber ku ji daneyên dîtir dem û cihê istinsaxa wê tên zanîn û di çarçoveya zanyariyên berdest de tekane nusxeya Mem û Zîna Akifê Wanî ye xwedî girîngiyeke mezin e.

Muellifê Mem û Zîna duyem Aşiq Soman Sipkî ji eşîra Sipkan gundê Uznî ye ku nêzî Erzîrûmê ye û hevalê Akifê Wanî ye. Peyvên “faiq” ku di berhema wî de derbas dibin ne mexles in û pêwendiyekê di navbera wî û Ehmed Faiq de saz nakin. Ev kesayetekî cuda ye û mexlesa wî jî Nezmî ye. Li Erzîrûmê wek dengbêjê waliyê Erzîrûmê Çapanoğlu xebitiye û halê wî gelekî xweş bûye. Lêbelê peyra rewşa wî xirab bûye veqetiyaye gundê xwe. Li ser mirina Akifê Wanî ku Mem û Zîna wî nivco mabû, Mem û Zîn bi tevahî tercumeyî tirkî kiriye. Di sala 1867an de li Erzîrûmê destûr daye Jaba ku nusxeyekê ji Mem û Zîna wî kopî bike. Nusxeya muellif bixwe ji aliyê malbateke tacir a Îranî ve (malbata Sultan el-Quraî) ve hatiye bidestxistin û niha li Tehranê tê parastin.

Her du nusxe jî şûna ku wek “Mem û Zîn” bîna binavkirin bi navekî taybet hatine binavkirin. Herçiqas ji aliyê hin lêkolîneran ve kalîgrafiya vî navî bi şaşî wek “Reyhînê Eşq” hatibe xwendin jî, taybetiyên kalîgrafîk nîşan didin ku ev şêweya xwendinê şaş e û ya rast divê “Riyazê Eşq” be. Pêşî Akifê Wanî ev nav li berhema xwe kiriye. Piştî xebatkarên koleksiyona A. Jaba ev navê berhema Akifê Wanî li ser nusxeya Jaba ya Mem û Zîna Aşiq Osman Sipkî jî nivîsîne. Lêbelê divê bê zanîn ku ev nav di nusxeya muellif a Mem û Zîna Sipkî de nehatiye bikaranîn. Yanî bikaranîna vî navî di nusxeya Aşiq Osman Sipkî de taserufeke xebatkarên koleksiyona A. Jaba ye.

Her du nusxe jî ji aliyê fêmbariyê ve baş in, lêbelê ji lawazbûna hunerên destnivîsan û kêmasiya hin taybetiyên standart ên destnivîsan tê fêmkirin ku bi lez û bez hatine istinsaxkirin. Xuyaye dema her du muellif hatine Erzîrûmê û A. Jaba daxwaza kopyayekê ji wan kiriye di demeke berteng de hatine istinsaxkirin. Hin kêmasiyên ku di her duyan de hevbeş ev in: Jimarebendî ne li gor sîstema standart a destnivîsan e, wereq 1b vala ne, cedwel ne tam in, di zehriyeyê de bêyî neqş û tezhîbê tenê navê berhemê û navê muellif hatiye nivîsîn, di rûpelên ewil de serlewhe tune ye û hwd.

JÊDER

Jêderên Çapkirî:

Adak, A. (2015). “Li Gorî Serdemên Tarîxî Têkiliyên di Navbera Edebiyatên Kurdî û Tirkî yê Klasîk de”, *Sempozyûma Edebiyata Berawirdî -Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî*, (amd. Nüket Esen & Ramazan Çeçen), Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Adak, A. (2012). “Di Serdema Osmaniyana de li Pey Rêça Ehmedê Xanê Sê Mem û Zînê bi Tirkî”, *Nûbihar*, j.120, r. 16-23.

Bergsträsser, G. (2011). *Metin Tenkidi ve Yazma Metinleri Yayınlama İlkeleri*, amd. Muhammed Hamdi el-Bekri, Çev. Eyyüp Tanrıverdi, İstanbul: Kitabevi.

Binbîn, E û Şewqî T (2005). *Mu'cem Mustelehat el-Mextût el-'Erebî Qamûs Kodîkolocî*, Merakeş: el-Xizane el-Heseniyye er-Ribat.

Dehqan, M. (2017). “A Late Ottoman Turkish Verse Version of Xani’s Mem û Zîn in the Manuscript Collection of Teh Islamic Consultative Assembly Library”, *Manuscripta Orientalia*, Vol.13 No 2 June 2007.

Esîlan, E. E. (1994). *Tehqîqu'l-Mextûtat beyne'l-Waqi' we'n-Nehc el-Emsel*, Riyad: Mektebet el-Melik Fehd el-Weteniyye.

Faik, A. (1969). *Mem o Zin*, amd. Sırrı Dadaşbilge, İstanbul: Matbaa Teknisyenleri Basımevi.

Karataş, Y. (2014). *Bayezid Sancağı ve İdarecileri (1700-1914)*, İstanbul: Kitabevi.

Levend, A. S. (2008). *Türk Edebiyatı Tarihi*, İstanbul: Türk Tarih Kurumu Yay.

el-Munecid, S. (1987). *Qewa'id Tehqîq el-Mextûtat*, Dar el-Kitab el-Cedîd, Beyrûd: Dar el-Kitab el-Cedîd.

Nazmi (2017). *Reyahin-i Aşk*, (amd. Mustafa Öztürk), Diyarbakır: Weşanên Lîs.

Öztürk (2017). “Eser ve Nüsha ile İlgili Bilgiler”, *Nazmi Reyahin-i Aşk*, Diyarbakır: Weşanên Lîs.

Tek, A. (2018). *Hamisiz Şair Babasız Metin Mem û Zîn ve Osmanlıca Çeviriler Üzerine Bir İnceleme*, İstanbul: Nûbihar.

Toska, Z. (2015). “Klasik Edebiyat Bağlamında Mem û Zîn Mesnevisi”, *Sempozîyûma Edebiyata Berawirdî -Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî*, (amd. Nüket Esen & Ramazan Çeçen), Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Togan, A. Z. V. (1985). *Tarihte Usul*, İstanbul: Enderun Kitabevi.

Jêderên Destnivîs:

Jaba, A. (?) *Catalogue de Manuscripts Kurdes*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsya, j. Kurd 53.


Jaba, A. (?) [*Têbîniyên Jaba*], nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsya, j. Kurd 54.

Sipkî, ‘A. (sala istinsaxê: 1283). *Riyazê Eşq*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsya, j. Kurd 38.


Sipkî, ‘A. (sala istinsaxê: 1273). *Memî û Zîn*, Kutubxaneyê Meclisê Şûraya Millî ya Tehranê, j. 9385.

Wanî ‘A. (?) *Riyazê Eşq*, nusxeya dijîtal a arşîva A. Jaba, Pirtûkxaneyê Giştî ya Lenîngradê, Rûsya, j. Kurd 39.


Kurd 39 (Akifê Wanî)



Zehriye (wr. 1a)




Rûpela Pêşiyê (wr. 2a)




Rûpela Dawiyê (wr.36a)


Kurd 38 (Aşiq Osman Sipkî)



Zehriye (wr. 1a)



Rûpela Pêşiyê (wr. 2a)



Rûpela Dawiyê (wr. 59a)